Rojnamegeran wezîr Bozdag derewand

WEZÎRÊ AKP'ê Bekir Bozdag îdia kir ku li Tirkiyeyê rojnamegerên girtî tune ne. Lê belê lîste û raporên sazî û dezgehên rojnamegeriyê Bozdag diderewînin û datînin holê ku Tirkiye bûye zindana rojnamegeran... → R6

Ceren hat girtin

Rojnamegera jin Ceren Taşkin a ku di rojnameya Hatay Sesê de dixebite, bi hinceta di medyaya civakî de "propagandaya rêxistinê kiriye" hat girtin. Taşkin bi rê kirin Girtîgeha Hatayê... → R6

ROJNAMEGERÎ NE SÛC E

6 rojnameger bi kêfî 20 roj in di bin çavan de ne

- Parêzerên rojnamegeran destnîşan kir ku dozger ji bo ku delîlên sûc peyda bike dema binçavkirinê dirêj dike û di bêhiqûqiya xwe de israr dike.
- Hevalên me yên rojnameger Omer Çelîk, Metîn Yoksu, Tunca Ogreten, Derya Okatan, Mahîr Kanaat û Eray Saygin 20 roj in bi kêfî tên ragirtin... → R6

ROJEVA
Medya

13 Çile În 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 64

AKP'ê dîktatorî tercîh kir

Di van rojan de ku AKP'ê ji bo îqtîdara ebedî çavên xwe tarî kirine, dahûrandinên Rêberê Gelê Kurd ên der barê AKP'ê de ji bo fêmkirina pêvajoyê pir girîng in

Şêxmedsûd ji bo Serokê xwe meşiya

Li taxa Şêxmeqsûd a Helebê ku navnîşana jiyana bi hev re ya gelên Sûriyeyê ye bi pêşengiya TEV-DEM'ê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meş hat lidarxistin û azadiya wî hat xwestin... RÛPEL - 7

GUHERTINA DESTÛRA BINGEHÎN

Rêberê Gelê Kurd Ocalan di parêznameya xwe ya dawîn de destnîşan dike ku AKP berhema Komara Duyemîn e ku bi darbeya 12'ê Îlonê hatiye xwedîkirin. Ocalan destnîşan dike ku AKP dixwaze desthilatdariya xwe ya hegemonîk bi guhertina destûra bingehîn tacîdar bike.

SEDEMA KRÎZA CIVAKÎ Û POLÎTÎK

Ocalan diyar dike ku Komara Duyemîn ji ber vî şerê hanê di nav krîzeke civakî û polîtîk de ye û li ber AKP'ê du rê hene; yan domandina şer an jî çareseriya demokratîk. Wisa xuya ye ku AKP'ê şer tercîh kiriye. Şerê ji sala 2015'an û vir ve jî wekî ku Ocalan dibêje Tirkiye ji hev xistiye... R- 8

Erdogan behsa azadiyê kir!

Erdogan di civîna keyayan de îdia kir ku li Tirkiyeyê azadî ji hemû deverên dinyayê zêdetir in... R - 6

Ciwan dê biçin Qendîlê

Li Başûr beriya demekê Pêşmergeyên Dêrîn çûbûn Qendîlê û pişgtiriya xwe ji bo hêzên gêrîla nîşan dabû. Ciwanên ji devera Raperîn destnîşan kir ku dê îro biçin Qendîlê û daxwaz ji ciwanên başûrê Kurdistanê kir ku piştgiriya helwesta Pêşmergeyên Dêrîn bikin... RÛPEL - 7

Divê her kes erka xwe bîne cih

Rêveberên Partiyên kurdistanî yên li Amedê bal kişand ser girîngiya Kongreya Netewî ya Kurdistanê û got ku di serdemeke wisa krîtîk de ji bo kombûna kongreyê divê her kes peywira dikeve ser milê wan bi cih bîne. Siyasetmedaran got ku divê her kes ji bo kongreyê bixebite... RÛPEL - 7

Şengal cih û warê me ye

Jinên şengalî bang li êzidiyên bi zorê ji kampan hatine derxistin kir û wiha got: "Şengal warê êzidiyan e. Divê em li ser axa xwe bijîn. Şengal ji Tirkiyeyê ewletir e." Şahida komkujiya Şengalê Nûda Bêrîvan a ku tev li PKK'ê bû jî da zanîn ku wê xwe bi saya PKK'ê ji nû ve afirandiye... RÛPEL - 2/3

Mêr nikarin rêveberiya jinan bikin... → R2

PDK sey AKPyî têgêrena... → R10

Eke kurdî nêbî do şer derg bibo

Rojnameger û nuştox Îbrahîm Gezîcî û nuştox Heysem Alîyî derheqê pêvînayîşê ke do Astana de bêrî kerdiş de qisey kerdî. Heysem Alîyî wina va: "Eke kurdî ca nêgirî do şer zaf derg bibo. Eke kurdî bibî çareserî, eke çinêbî do şer bêro qiseykerdiş."...RÛPEL - 11

TIRKIYE PÊLA DAGIRKERIYÊ FIREH DIKE

Tang ajotin ser çemê Sacûrê

Dewleta tirk piştî dagirkirina Cerablusê berê xwe da Babê, niha jî çavên xwe kutaye Minbicê

Dewlata tirk berê tangên xwe da çemê Sacûrê ku li ser sînorê Minbicê ye. Serokomarê tirk gotibû ku ew ê dest di Minbicê jî werdin. Minbiciyan da zanîn ku wan bajarê xwe ji DAIŞ'ê rizgar kiriye û ew dagirkeriyê qebûl nakin... RÛPEL - 5

‘Vî şerî rawestînin; em vegerin welatê xwe!’

DELAL Û SEDRA du zarokên keç in ku bi malbatên xwe re ji ber şerê li Sûriyeyê koç kirine. Delala 9 salî, Sedraya 7 salî û sê xwişk û birayên wan ên jê biçûktir hene. Ji ber ku milê bavê wan tune ye, barê giran li ser milê wan e. Delal mendîlan û Sedra jî avê difiroşe. Delal û Sedra neçar dimînin welatê xwe terk bikin, lê dest ji xeyalên xwe bernadin. Her du jî tevî her tiştî girêdayî xeyalên xwe ne û ya ku dilê wan germ dike jî xeyalên wan in. Li welatê ku zimanê wê nizanin têkoşîna jiyanê didin. Xeyala wan vegera welat, dibistan, heval û zarokatiya wan e. Di bedena wan a biçûk de fikr û nêrînên mezin hene. Dizanin li vî bajarî ne di parastinê de ne. Lê dibêjin tu tiştekî bikin tune ye. Rast dibêjin. Tiştê ew bikin tune ye. Sedema vî şerî ne Delal û Sedra ne. Lê gelek kesên dikarin ji bo wan tiştekî bikin hene. Delal û Sedra dibêjin; vî şerî rawestînin û em jî vegerin welatê xwe! **RIHA - ŞÛJIN**

13 Çile 2017 În

‘Şengal ji Tirkiyeyê ewletir e’

Jinên Şengalê bang li êzidiyên bi zorê ji kampan hatine derxistin kir û got: “Şengal warê êzidiyan e. Ji bo çanda me bijî divê em li ser axa xwe bijîn. Şengal ji Tirkiyeyê ewletir e.”

Piştî êrîşa DAIŞ’ê ya li hemberî Şengalê bi hezaran êzidî ji Deriyê Xaburê derbas bûn û li bajarên Amed, Riha, Şirnex û Mêrdînê li kampên şaredariyan bi cih bûn. Lê piştî qeyûm tayînî şaredariyan hat kirin û şûnde êzidiyên li kampan diman jê hatin derxistin û bi zorê li kampên AFAD’ê hatin bicihkirin. Jina bi navê Kamo Xidir a li gundê Til a Şengalê dijî got ku gundê wan ji DAIŞ’ê hatiye paqij kirin û wiha got: “Me ji nû ve dest bi çandiniyê kir. Jiyan normal bûye. Ez li kampê mam demekê. Jiyan gelekî zehmet bû. Çawa Şengal azad bû em vegeriyan. Dibistan vebûn. Ocaxên tenduristiyê vebûn. Zarokên me li mewziyan in. Êdî em natirsin, dilê me rehet e.”

Kamo Xidir da zanîn ku xetereya komkujiya li hemberî êzidiyan didome û wiha axivî: “Gelê me li wir li

cem şaredariyan stirîn. Bi wan bawer bû. An jî me dizanî dewlet dê çi bîne serê wan. Dixwazin niha gelê me li wan kampan dîl bigirin. Em ji jiyana wan bi fikar in. Em dixwazin vegerin. Li wir nikarin xwe biparêzin. Şengal ji Tirkiyeyê ewletir e.” Delal Husan ya ji bajaroka Sunune dijî jî bang li êzidiyên li kampan dijîn kir û ev tişt anî ziman: “Em ne hewcedarî kesî ne. Li vir em hewcedariyên xwe peyda dikin. Em natirsin. Şengal welatê êzidiyan e. Em ji bo çanda xwe divê li ser axa xwe bijîn. Derî ji her kesî re vekirî ye. Hûn werin, çi ji destê me bê em ê bikin. Tenê bila gelê me di ewlehiyê de be.” Nurê Behro jî anî ziman ku ev der axa wan e, çanda wan e û destnîşan kir ku piştî vegeriya gundê xwe pez û mirîşkan xwedî dike. Behro anî ziman ku divê gel vegerin ser axa xwe û malên xwe.

ŞENGAL - ŞÛJIN

Mêr nikarin rêveberiya jinan bikin

Rojên herî serkeftî û kêfxweş ên mirovahiyê bi pêşengiya jinan a civakî pêk hatin û hatin nivîsandin. Dîroka herî trajîk jî bi windakirina pêşengiya civakî ya ji aliyê jinan ve, ya rast ji destê wan hat girtin û van rojên trajik bi vî awayî dest pê kir. Helbet jiyan statîk û yekrêzî nîn e. Pêvajoyên têkoşînê yên ji bo ku hêviya serkeftin û kêfxweşiyê careke din neyê windakirin jî vê dîroka trajîk û tijî êş jiyandar dike.

Her ku jin firsendekî dibînin, hewl didin ji bo pêşengiya civakî rê û rêbazên nû peyda bikin. Li her dera cîhanê hest, raman û destkeftiyên jinan heman in. Loma carinan rê û rêbaz jî hevpar dibin. Di van 40 sal dawî de destkeftî û azweriya têkoşînê ya jinên kurd ji bo bidestxistina pêşengiya civakî pir bi pêş ve çû. Nemaze ji bo temsileyeta wekhev, civakîbûna jiyanê û rêveberiya demokratîk û ji bo pêş ve çûna pêşengiya civakî ya jinan pergala hevserokatiyê bû rol-model û pêngaveke dîrokî. Di demeke kin de hem ji aliyê jinan ve hem jî ji aliyê tevahiya civakê ve hat pejirandin. Dibe ku di serî de dinav mekanîzmayên rêveberiyê de pratîk bû be lê pergala hevserokatiyê di esasê xwe de şêwaza jiyaneke azadîparêz, wekhevîparêz û demokratîk e. Her wiha modela jiyaneke alternatîf e.

Destar

Sarya Denîz

Ji bo dewleta serdest, feraseta nêr û çanda mêran wek xetereyeke mezin tê dîtin. Ji ber ku hevserokatî wekheviya zayenda civakî diparêze, bû hedefa polîtîkayên faşîst ên desthilatiya AKP’ê. Ev feraseta faşîst û desthilatperest ji bo tevahiya civakê xetereye û herî zêde jî li jinan dixe. Bi dehan sazî û dezgehên jinan girtin. Hemû mekanîzmayên ku jin tê de xwedî îradene, belav kirin. Nemaze qeyûmên tayînî şaredariyan kirin, di serî de yekîneyên jinan belav kirin, projeyên jinan asteng kirin û saziyên jinan girtin. Yên mayîn jî mêr tayînî rêveberiyên wan kirin. Midûriyeta polîtîkayên jinan a Şaredariya Wanê mînaka vê ya berbiçav e. Mêrê ku lê hate tayînkirin wek karê pêşîn Yekîneya Şîdetê girt.

Mêrek çawa dikare saziyeke jinan bi rê ve bibe? Ma dê çawa bikare temînatekê bide jinên mexdûrên şîdetê? Jixwe ew mêr bi xwe tiştên ku li jinan hatine kirin meşrû dibîne. Her cure hewldana ji bo jiholêrakirina vê meşrûiyetê dê asteng bike. Bo nimûne stargeh tên girtin û jinan mehkûmî bêçareseriyê dikin.

Bi girtina saziyên jinan û bertengkirina qadên jiyanê yên jinan hewl didin feraset û çanda mêran a ku her cure şîdetê meşrû dibîne, wêrektir bike. Ne tenê ji bo jinên mexdûrên şîdetê, her wiha ji bo hemû jinan fermanek e ku jinan dixe nav tariyeke tijî trajedî û êş. Ev yek dijminahiya jinan e. Dîsa dixwazin mêr jinan bi rê ve bibin. Lê belê mêr nikarin rêveberiya jinan bikin.

Jin baş dizanin ku armancên xweşik bi belayan têne tecrubekirin û bi xwe jî dilsoziyê tecrube dikin. Heke mirov bi tenê bizane ku rojên serkeftî û kêfxweş û bidestxistina pêşengiya civakî ne dûr in, ji bo ku mirov jiyana trajîk û tijî êş li pey xwe bihêle, bes e.

Servîsa kirmackî dest pê kir

Demek berê li ser întenternetê bi navê www.gazetesujin.com ajansa nûçeyan dest bi weşanê kir. Şujinê destpêkê bi çar zimanan; tirkî, kurdî, erebî û îngilîzî dest bi weşanê kir. Piştre rojnameyê her wiha zaravayê kurdî yê soranî jî lê zêde kir û herî dawî jî bi zaravayê kirmanckî (zazakî) jî dest bi weşanê kir. Di Şûjinê de herî zêde nûçeyên jinan tên dayîn û bi vî awayî dixwaze bibe deng û rengê hemû jinan. **AMED**

'Sakîna Cansiz di mercên herî dijwar de têkoşîn domand'

Kongreya Star a navçeya Mabata têkoşerên jin ên kurd Sakîne û hevreyên wê bi civînekê bi bîr anîn. Civîn li navçeya Mabata ya girêdayî Kantona Efrînê bi amadebûna bi dehan jinan pêk hat. Salona civînê bi wêneyên cangoriyan, ala Kongreya Star û posteyên Ocalan hat xemilandin. Piştî rêzgirtinê, Rêvebera Kongreya Star a Mabata Tara Xemgîn axivî û jiyana her sê têkoşeran a di têkoşîna rizgariya gelê kurd de vegot. Tara diyar kir ku rêwîtiya ber bi azadiyê ve berdewam dike. Tara destnîşan kir ku Fransa bi navê demokratîkbûnê bang dike lê belê ev ne rast e û divê Fransa komkujiyê demildest ronî bike. Civîn bi dûrişmên silavkirina berxwedana jinan bi dawî bû. **EFRÎN**

Nuriye Gulmen: Heta ez mafê xwe bistînim li vir im

Akademîsyen Nuriye Gulmen a ji kar hate dûrxistin ji 9’ê mijdarê ve got ‘ez karê xwe dixwazim’ û dest bi çalakiyê kir. Gulmen destnîşan kir ku ew dixwaze peywira xwe şûnde bigire û wiha got: “Bila OHAL bê rakirin. Bila kedkarên demokratîk û şoreşger yên hatine avêtin karê wan bê radestkirin. Bila dawî li vê bêhiqûqiyê bê anîn. Bila 13 hezar OYP’î ewlehiya wan ya kadroyê şûnde bê dayîn.”

Gulmen anî ziman ku piştî ji kar hat derxistin û şûnde bi KHK’a dawî re hat îxrackirin. Gulmen roja dest bi berxwedanê kir şûnde gelek caran hat binçavkirin û di lîsteya ‘Jinên di 2016’an de li pêş bûn’ ya CNN International de jî cihê xwe girt. Gulmen diyar kir ku îxrackirina akademîsyenan didome û ev êrîş ne tenê li dijî akademîsyenan e û wiha got: “Ev darbeya tê gotin li dijî FETO’yê ye, di esasê xwe de li dijî perwerdê ye. Ji me, ji demokratên şoreşger tirsiyan. Em ji xwe di hedefa wan de ne. Hewl dan muxalîfan paqij bikin. Pêwîstî bi berxwedana topyekûn heye. Divê hemû kedkarên cemaweriyê li dijî van êrîşan çalakiyan pêk bînin.”

Gulmen destnîşan kir ku wê bi berxwedana xwe li cîhanê deng veda û dê ev berxwedan bidome. ***ENQERE - ŞÛJIN***

Şer û berxwedana Sarayan bû ya gel

Her sê jinên kurd ên şoreşger ên li Parîsê hatin qetilkirin li Saziya Malbatên Şehîdan ya Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) hatin bibîranîn. Di merasîmê de gelek kes amade bûn. Di biranînê de endama Koordînasyona Meclisa Îştarê Şîlan Rojînda axivî û diyar kir ku xwestin bi komkujiyê peyamekê bidin Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo ku dest ji pêvajoyê berde lê Rêbertî ew têk birin. Rojînda destnîşan kir ku îro şer û berxwedana Sakineyan bûye ya gelê kurd. Rojînda da zanîn ku divê her kes ji xwe re xeta Sara mînak bigire. Piştî Rojînda li ser navê endamê Saziya Malbatên Şehîdan Mamoste Sofî jî helbestek ji bo sê jinên şoreşger xwend. Merasîm bi dirûşmên, ‘Şehîd Namirin’ û ‘Bijî Serok Apo’ bi dawî bû. **MEXMÛR**

ROJEVA Medya
13 Çile 2017 În

Xwe ji nû ve diafirînin

Şahida komkujiya Şengalê Nûda Bêrîvan bi vê gotinê, qala sedema tevlibûna xwe ya li nava refên PKK'ê kir: "Jiyana PKK'ê bû jiyana min a duyemîn, min xwe ji nû ve afirand."

ZEYNEP NÊRGIZ BOTAN – BEHDÎNAN / ANF

Şahida komkujiya Şengalê Nûda Bêrîvan sedema tevlîbûna xwe ya li nava refên YJA Starê vegot. Rêwîtiya me ya li qadên gerîla dewam dike. Di her gavê de bedewiyeke nû derdikeve pêşiya me. Em hewl didin gelek wêneyên jiyana gerîla bikişînin.

Her jiyana ku bi PKK'ê re hatiye guhertin, bandoreke mezin li mirovan dike. Her gerîlayek em lê guhdarî dikin dibêje, "PKK ji bo min bû jiyana duyemîn, min xwe ji nû ve afirand." Vê carê jî em dixwazin jiyana Nûda ya 19 salî ku ji Komkujiya Şengalê rizgar bû, vebêjin.

Nûda Bêrîvan gerîlayeke YJA Starê ye. Ji bo tola bi hezaran jin, ciwan û zarokên êzidî yên di komkujiya Şengalê de jiyana xwe ji dest da hilîne, di sala 2016'an de tev li nava refên PKK'ê dibe. Nûda da zanîn ku wek jineke êzidî nedibû ew li pêşberî bûyerên qewimîne û diqewimin bê deng bimaya û wiha got: "Gelê min hatibû kuştin. Hemû nirxên me hatibûn tunekirin. Jinên me li bazaran mîna koleyan hatibûn firotin, destavêtin li wan hatibû kirin. Dema ferman rabû, ewilî me fêm nekir bê kê ev kiriye. Piştre me dît ku PDK a ku diviyabû em biparastana, li pişta me daye. Li dijî vê rewşê, gerîlayên PKK'ê yên xwedî felsefeya Rêbertî hatin em parastin. Em ji nû ve zindî kirin. Wek jineke êzidî nedibû ez jî li pêşberî vê rewşê bê deng bimama. Çi dibe bila bibe, diviyabû min tola gelê Şengalê hilaniya.Cihê herî xurt û rast ê ji bo hilanîna tolê, refên PKK'ê bû. Min biryar da tev li nava PKK'ê bibim."

XWE PERWERDE DIKIN

Nûda wiha behsa hatina xwe ya çiyê kir: "Piştî ku hatim çiyê, min bêhtir Rêber Apo nas kir. Her wiha derfetên min çêbûn ku dîroka me, çanda me ji nêz ve lêkolîn bikim. Her ku min Rêbertî dixwend, bi xwe dihesiyam ku mîna çûkekê sivik bûme. Wekî din em bi berfirehî dîroka jinan, dîroka mirovahiyê hîn bûn. Derfet çêbû ku sîstema modernîteya kapîtalîst bi berfirehî analîz bikim. Niha wek jinekê ez xwe hê bi hêz dibînim. Ne tenê li dijî DAIŞ'ê ez xwe perwerde dikim ku li dijî hemû hêzên mêtinger û piyonên wan şer bikim."

JIYANA LI NAV PKK'Ê

Nûda herî dawî wiha bang li jin û ciwanên Şengalê kir: "Saleke min tijî bû di nava refên PKK'ê de. Perwerdeyê gelek tecrûbe dan min. Ne tenê jinên Şengalê, eger hemû jinên êzidî dixwazin di rêya azadiyê de bimeşin, divê jiyana PKK'ê nas bikin. Ez dixwazim ew jî tev li nava refên me bibin û li dijî çeteyan heta dawiyê şer bikin."

Lîstika ji bo ji ceza xelas bibe

Li Amedê, Aykut Eryilmaz ê hevalê xwe Mehmet Încî bi çekê kuşt, hat zanîn ku ji bo ji cinayetê xelas bibe wiha gotiye: "Xwest min bişîne çiyê. Min jî kişand û berdayê." Her wiha tê îdiakirin ku yê cinayet pêk aniye ne Eryilmaz e, bavê wî Sipahattin Eryilmaz bi xwe ye. Bavê Mehmet Încî, Îrfan Încî anî ziman ku komplo li kurê wî hatiye kirin. Bav Încî got ku tu pirsgirêka wan bi kesên kurê wî re kuştiye berê tune bûye û got ku cinayet bi awayekî plankirî pêk hatiye. AMED

Li gundan qedexe hat îlankirin

Walîtiya tirk a li Amedê, li 13 gundên navçeyên Licê û Hênê, ji ber operasyona leşkerî duh ji saet 05:00'an û pê ve "qedexeya derketina derve" ragihand. Gundên derketina derve lê hatiye qedexekirin, ev in: "Bîrlîk, Şenlîk, Ergînkoy, Tûzlakoy, Çeper, Daralan û Dûrûkoy ên Licê û Kaledîbî, Yûkaritûrali, Topçûlar, Akçayûrt, Ûzûnlar û Kalaba yên Hênê. AMED

Nahêlin şermezar jî bikin

Di doza Ekrem Kaçeroglu yê ku di dema êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Kobanê şermezar dikir de rastî êrîşa komekê hat û hat qetilkirin de bersûc tevli dozê nebûn û di heman rojê û haman cihî ji ber qetilkirin şermezar kirin der barê Leyla Îldemîz, Abdulrezzak Karataş û Abdulcebbar Înan de doz hat vekirin û ji her yekê re 3 sal cezayê girtîgehê hat dayîn. İZMİR

Ji bo her tiştî îşkence pêk anîn

Li girtîgehan pêkanînên sînorkirina hevdîtinan, yek tîp cil, grevên birçîbûnê û îşkence her tim hebûn û heta roja me ya îro tê. Di 12'ê sibata 1988'an de hevdîtinên bi malbatan re hatin dawîkirin û ji wê rojê şûnde kuliyatek berxwedanê didome. 4 sal beriya vê dîrokê yanî di 14'ê çileyê 1984'an de îdareya girtîgeha Metrîsê operasyon pêk anî û şal, çakêt, fakeyên bi boxaz, palto, mont û pêlav hatin qedexekirin. Rojnameger Ertugrul Mavîoglu di pirtûka xwe ya diyar kiri bû ku 3 salan pîjameyên xwe bi nevrîsêmên xwe çêkirine û di 11'ê Nîsana 1984'an de di koxuşa tecrîdê de rojiya mirinê hatiye destpêkirin. AMED

Înfaza xwe kirin serdagirtin

Li taxa Çalê ya Sêrtê du jinên bi navê Pinar Ateş (Viyan) û jina hêj navê wê nehat zanîn, ji aliyê polîsan ve hatin înfazkirin. Bûyer li kolana 215'an pêk hat. Her çi qas Walîtiya Sêrtê înfaz wek serdagirtina malan û pêvçûn bide xuyakirin jî şêniyên taxê bi dîtinên xwe înfazê piştrast dikin.

Bi ragihandinên welatiyan derket holê ku bûyer ne li malê li kolanê çêbûye û jin li kolanê hatine înfazkirin. Li kolana ku bûyer pêk hat jî qalikên guleyan, xwîn û di dîwarên xaniyan de şopên guleyan her tîştî radixe ber çavan.

Li gorî ragihandinên şêniyên taxê yên ku ji ber ewlehiyê nexwestin navê xwe bidin dan zanîn ku pevçûn çênebûye rasterast jin hatine înfazkirin. Welatiyekî got ku di serî de çend dest dengê çekan hatiyê û piştî dengê çekan 2 seat şûnde li taxê bombeyek bi bandor hatiyê teqandin. Welatî diyar kir ku dîwar û camên avahiyên wan ji ber dengê bombeyê hilweşiyan e.

Welatî anî ziman ku wan tenê cenazeyek dîtiye û wiha got: "Piştî înfazê gelek polîs hatin cihê bûyerê û tenê cenazeyek xistin ambulansê. Ji serê sibê de jî hemû şopên înfazê ji holê rakirin."

SÊRT - ŞÛJIN

Çand û dîrokê tune dikin

Qedexeya derketina derve ya li Sûrê hîna li çar taxan bi awayekî fermî didome. Ji aliyê hikumetê ve 'plana îmarê ya Sûrê' di rojên borî de zelal bû. Bi vê plana ku hatiye amadekirin re hat gotin ku dê dîroka hatiye tunekirin ji nû ve bê zindîkirin.

Hevseroka Şaxa Amedê ya Odeya Plansaziya Bajar Buşra Cîzregolîogullari diyar kir ku daxuyaniyên 'îmarê' li dij plana parastinê ya ji bo Sûrê ye û got ku bi vê planê re avahiyên li Sûrê mane jî dê bên hilweşandin.

Cîzregolîogullari diyar kir ku heta îro pêkhateyên bajar tev li plana ji bo Sûrê nehatine kirin û got ku dê bi plana îmarê ya dawîn re dîrok û çand bê tunekirin. Cîzregolîogullari bi lêv kir ku dê pêvajoya hiqûqî li dijî planê bidin destpêkirin.

AMED - DÎHABER

Dîmenên qetilkirinê nîşanî parêzer nedan

Doza qetilkirina Dîlek Dogan a ku polîsê bi navê Yuksel Mogultay tê de tê darizandin rûniştina 5'emîn li 12'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Çaglayana Stenbolê hat dîtin. Doza ku ji çapemeniyê re girtî, polîsê bersûc tev lê nebû û di dozê de malbata Dogan amade bû. Doza bi tespîta nasnameyan dest pê kir, ji ber dîmenên der barê dema Dîlek Dogan hat qetilkirin de hatibûn jêbirin, bi armanca dîmen paşde bên vegerandin ji Laboratuvara Krîmînal a Fermandariya Gişti ya Cendirmeyan re hatibûn şandin û hat diyarkirin ku bersiv bi raporê hatiye şandin. Heyeta dadgehê ku daxwaza parêzeran a divê dîmenan bidin wan bi hinceta "Ger dîmen ji aliyan re bê dayîn dê taybetiya kesên di dîmenan de ne, bê îxmalkirin" red kir. Dadgehê doz taloqî 8'ê Adarê kir.

STENBOL – DÎHABER

Pêşî kuştin û piştre jî çek danîn ser wî

Di 10'ê çileyê de kesê bi navê Muslim Kasar (31) dema diçû midûriyeta polisan a Dîlokê alozî derket û di bûyerê de polîsek bi giranî birîndar bû û Kasar jî jiyana xwe ji dest da. Piştî ku Kasar jiyana xwe ji dest da ji malbata wî 6 kes binçav kirin.

Dayîka Kasar, Leyla Kasar a 60 salî bertek nîşanî daxuyaniyên berpirsyaran û nûçeyan da û wiha got: "Min nimêja nîvro kir, kurê min ji min re got 'ez ê biçim jixwe re montekî bikirim'. Piştî çû telefonî min kir û got 'eger nan li dikanê nemabe ez ê ji xwediyê firinê re bêjim bila nan ji me re bîne'. Piştî wê min çend telefonî wî kir bersiv neda. Çeka kurê min tune bû. Kurê min nexweş bû, rapora wî ya astengdariya hiş a ji sedî 50 hebû. Nexweşiya sara hebû û sê caran emeliyat bûbû. Wan kurê min kuşt û piştre çek danî ser wî."

Dayik Leyla Kasar da zanîn ku kurê wê ji ber nexweşiya xwe li leşkeriyê jî çek nedane wî û çek bi kar neaniye. ***DÎLOK - ŞÛJIN***

4 leşker jî hatine binçavkirin

Lêpirsîna ku têkîldarî êrîşa li Qeyseriyê di 17'ê kanûna 2016'an de li dijî leşkeran pêk hat ber bi dawiyê ve diçe. Têkildarî êrîşê 23 kes hatibûn binçavkirin. Hat zanîn ku ji wan 4 leşkerên 1'yekemîn Tugaya Komandayan in. Piştî êrîşê bi temamî 29 kes hatibûn binçavkirin. Hat îdiakirin ku 4 leşkerên ku propagandaya PKK'ê kirine agahî daye TAK'ê.

ENQERE - DÎHABER

www.ertsivak

Awusturya dibe modela hawirparêziyê

AWUSTURYA HEWL dide di 13 salên pêş de herî kêm 40 milyar euro razemeniyê ji bo enerjîya xwenûker veqetîne û bibe 'Dewleta Model a Hawirparêz'. Serokwezîrê Awusturyayê Christian Kern li platformeke li bajarê Welsê qala projeyên hikumetê kir û diyar kir ku welatê wan dê bêhtir berê xwe bide enerjiya xwenûker. Kern anî ziman ku ew dixwazin bibin 'Dewleteke Model a Hawirparêz' û destnîşan kir ku ew armanc dikin heta 2030'an bi qasî 40 milyar euro razemeniyê li vê qadê bikin. Li aliyê din Christian Kern ragihand ku ew dixwazin mûçeyê kêmtirîn bigihînin hezar û 500 euro, giraniya burokratîk sivik bikin û derfetan bidin şîrketan. Kern da zanîn ku ew plan dikin heta 2020'an bi qasî 200 hezar cihên kar biafirînin û kesî bê kar nehêlin. **WELS**

13 Çile 2017 În

Trump dê gemariyê zêde bike

Li gorî Rapora Rîska Global welatên Ewropayê ber bi rastgiriyê ve diçin û hewldanên li dijî germa global û parastina hawirdorê ji ber polîtîkayên Trump ên di vê mijarê de bi ser nakevin

Forûma Aborî ya Cîhanê (WEF) dê di 17'ê Çileyê de li bajaroka Davosê ya Swîsreyê dest pê bike. Beriya ku WEF dest pê bike Rapora Rîska Global hat weşandin. Di raporê de ji bo mijarên gemarîkirina hawirdorê, dijberî û rîskên partiyên siyasî yên populîst hişyarî tê dayîn. Rapora ku di encama hevdîtin û danûstandinên bi zanyar û nûnerên şîrketan re hatiye amadekirin de tê destnîşankirin ku xala herî zêde gefê li pergalê dixwe populîzm e.

Di raporê de serkeftina Donald Trump û derketina Brîtanyayê ya ji nav Yekitiya Ewropayê hatine bibîrxistin û hatiye gotin ku dê serkeftina Trump û derketina Brîtanyayê ya ji nav Yekitiya Ewropayê rê li ber guhertinên mezin veke. Rapor balê dikişîne ser xurtbûna partiyên rastgir û populîst ên li welatên Ewropayê û hatiye destnîşankirin ku dê di hilbijartinên Almanya, Fransa, Îtalya û Hollandayê de partiyên rastgir û populîst bi ser bikevin û welat ber bi rastgiriyê ve biçin.

Li aliyê din di raporê de tê ragihandin ku li gel hewldanên li dijî germa global û parastina hawirdorê jî dê di vê mijarê de rewşeke neyînî derkeve holê û ji ber Trump hedefên ji bo kêmkirina belavkirina karbondîoksîtê dê bi ser nekevin. Her wiha di raporê de tê texmînkirin ku mezinbûna aborî li qada global dê dewam bike û ev yek jî dê bandorê li sermayeyê bike. ***ANF***

Lêborîna rastiya sîxûriya Diyanetê

Sîxuriya melayên girêdayî Diyanetê ya li Ewropayê hat piştraskirin. Serokê Yekitiya Tirk-Îslamê ya Karên Diyanetê (DÎTÎB) Bekîr Alboga der barê sîxuriya melayan de ji rojnameya Rheinische Postê re axivî û piştrast kir ku melayên girêdayî Diyanetê, li Almanyayê ji bo MÎT'ê karên sîxuriyê kirine. Boga piştî ku sîxûriya meleyên Dîyanetê piştrast kir, ji ber sîxûriyê lêborîn jî xwest. Wezareta Karên Derve ya Almanyayê jî diyar kir ku bandora siyasî li ser DÎTÎB'ê gelek e. **BERLÎN**

Leşker rastî êrîşê hatin

Li herêmên Segou û Moptî yên Maliyê li dijî Yekîneyên Artêşa Maliyê êrîşek bi mayînan pêk hat. Di encama êrîşê de 5 leşkerên Maliyê jiyana xwe ji dest da û gelek leşker jî birîndar bûn. Ji aliyê artêşa Maliyê ve der barê êrîşê de daxuyaniyek hat dayîn û di daxuyaniyê de hat ragihandin ku leşkerên wan rastî êrîşeke terorîst hatine. Li Maliyê di salên 2012-2013'an de di navbera artêşa Maliyê û berberiyên alîgirên serxwebûnê û El Qaîdeyê de şer û pevçûn derketibûn. **PARÎS**

Îranê balafira yekemîn kirî

Îranê piştî rakirina ambargoyên dewletên rojavayî yên li dijî xwe, cara yekemîn ji şîrketa bala¹ran a Airbus bala¹reke bi tûpa A321 kirî. Ji bo kirîna bala¹rê li navenda Airbusê ya li bajarê Toulouseyê yê Fransayê merasîmek hat lidarxistin. Di merasîmê de amblema Rêyên Hewayî yên Îranê bi bala¹rê ve hat zeliqandin û radestî Gerînendeyê Giştî yê Rêyên Hewayî yê Îranê Farhad Parvaresh hat kirin. Dî rojên pêş de dê 99 bala¹rên din jî radestî Îranê bên kirin. **PARÎS**

Nikaragua emanetî wan e

Di dîroka Nikaraguayê de cara yekemîn mêrek bû serokdewlet û hevsera wî jî bû cîgir. Daniel Ortega di 71 saliya xwe de ji bo serokdewletiya Nikaraguayê di mijdara 2016'an de cara sêyemîn hat hilbijartin.

Ortega beriya çend rojan sond xwar û dest bi peywira xwe kir. Hevsera Ortega Rosario Murillo jî li paytexta Nîkaraguayê Managuayê di hilbijartinan de bi ser ket û bû cîgira hevserê xwe serokdewlet Ortega.

Cîgira serokdewlet Murillo ya ku dayika 7 zarokan e, di merasîma sondxwarinê de got ku ew li ser navê jinên Nikaraguayê bûye cîgir û jin dikarin xwe bigihînên cihên ku heq dikin. ***MANAGUA***

Tirkiye sedema têkbirinê ye

Dîrektoriya Îstîxbarata Neteweyî ya Amerîkayê der barê polîtîkaya derve ya Tirkiyeyê ya demên dawîn de raporek weşand. Di raporê de hatiye destnîşankirin ku polîtîkaya Tirkiyeyê ya derve ya demên dawîn NATO'yê tehdît dike.

Her wiha di raporê de polîtîkayên antîdemokratîk ên Tirkiyeyê jî hatine bibîrxistin û tê gotin ku polîtîkaya derve ya Tirkiyeyê ku her diçe bêhtir serbixwe dibe û xwestekên antîdemokratîk ên li welêt di demeke kurt de dê nêrînên belavbûnê yên li Ewropayê zêde bike.

Piştî ku di raporê de ev rewş hatiye tespîtkirin, hişyarî hatiye kirin ku dê ev rewş li dijî hevsengiya NATO'yê û hevkariya NATO û Yekitiya Ewropayê tehdîtekê çêke. ***WASHINGTON***

Konferansa Qibrisê dest pê kir

Hevdîtinên li ser mijara Qibrisê yên ku li Ofîsa Neteweyên Yekbûyî (NY) a Cenevreyê bi tevlibûna serokên Qibrisê Mustafa Akinci û Nikos Anastasidis hatin destpêkirin, beriya du rojan bi pêşkêşkirina nexşerêyên aliyan bi dawî bûn. Piştî danûstandinên sê rojan, Şêwirmendê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî Espen Barth Eîde derket pêşberî çapemeniyê û diyar kir hevdîtin erênî derbas bûne.

Piştî ku hevdîtin erênî derbas bûn, duh bi tevlîbûna wezîrên karên derve yên welatên garantor Yewnanistan, Tirkiye û Brîtanyayê li buroya NY'yê ya li Cenevreyê, li ser mijarê konferans hat destpêkirin. Sekreterê Giştî yê NY'yê Antonio Gutteres tev li konferansê bû û axaftina vekirinê kir. Her wiha Yekitiya Ewropayê jî wek çavdêra taybet tev li konferansê bû. Yek ji mijarên girîng ên di konferansê de derdikevin pêş dê rewşa hebûna leşkerên tirk a li bakurê Qibrisê be.

Li aliyê din bi destpêkirina konferansê re rêxistinên Swîsre, Tirkiye û Kurdistanê li pêş avahiya NY'yê çalakî li dar xistin û xwest ku serokomarê tirk Recep Tayîp Erdogan ji ber sûcên xwe yên şer ên li Kurdistan û Tirkiyeyê, li dadgehên navneteweyî bê darizandin. ***CENEVRE***

Pûtîn û Nazarbayev li ser civîna Astanayê axivîn

Danûstandinê der barê hevdîtinên Astanayê de berdewam dikin. Serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn û serokkomarê Kazakistanê Nursultan Nazarbayev bi rêya telefonê der barê hevdîtinên Astanayê de axivîn. Kremlinê di malpera xwe ya fermî de der barê axaftinê de daxuyaniyek da û ragihand ku Pûtîn û Nazarbayev der barê amadekariyên civînên Sûriyeyê yên dê li Astanayê bên lidarxistin de axivîne. Dê hevdîtinên Astanayê roja 23'ê çileyê dest pê bikin. Li gel ku ev dîrok hatiye diyar kirin jî, tê gotin ku dê hevdîtin hefteyekê paş de bên xistin.

Li aliyê din Berdevka Wezareta Derve ya Rûsyayê Mariya Zaxarovayê di civîna xwe ya çapemeniyê ya heftane de diyar kir ku DAIŞ û El-Nusraya ku navê xwe kiriye Fetih El-Şam ji bo agirbesta Sûriyeyê têk bibin hemû îmkanên di destên xwe de bi kar tînin. **MOSKOV**

Sersaxî ji malbata Omerî re xwestin

Ji bo pêşwazîkirina serdanên sersaxiyê yên ji bo Koordînator û Endama Asayîşê Dr. Qehreman Omerî ku di 9'ê çileyê de di encama teqînekî de jiyana xwe ji dest dabû, li taxa Rojhilat a Qamişloyê kon hat vedan. Bi sedan şêniyên Qamişloyê kon ziyaret kirin û sersaxî ji malbatê re xwest. Di axaftinên sersaxiyê de hat gotin ku bi xwedîderketina keda şehîdan, xwedî li xwîna şehîdan jî tê derketin. Di dawiyê de jî soza şopandina rêya şehîdan hat dayîn. **QAMIŞLO**

Artêşa dagirker Babê topbaran dike

Êrîşên artêşa tirk a dagirker ên ku bi armanca dagirkirina Babê dane destpêkirin, didomin. Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmê, di çarçoveya van êrîşan de hêzên artêşa tirk di şeva 11'ê çileyê de bi fûzeyan bajarê Babê bi dijwarî topbaran kir. Çavkaniyan da zanîn ku di encama topbarana hêzên dagirker ên artêşa tirk de ziyanên madî gihaştin mal û milkê welatiyên Babê. Çavkaniyan diyar kir ku der barê encamên windahiyên sivîlan de tu agahî wernegirtine. **MINBIC**

Banga tevlîbûnê li
ciwanan kirin

Ciwanên taxên rojhilatê Helebê yên ku tev li YPG'ê bûne bang li hemû ciwanan kir ku cihê xwe di nava refên YPG/YPJ'ê de bigirin.

24 ciwanên ji pêkhateya ereb ên ji taxên rojhilatê Helebê ku piştî dewreya leşkerî ya Akademiya Şehîd Xebat a YPG'ê tevli refên YPG'ê bûn diyar kirin ku ew ji bo parastina gelê xwe tev li YPG'ê bûne. Der barê mijarê şervanê bi navê Ezîz Sîpan daxuyand ku YPG hemû gelên Sûriyeyê diparêze û wiha domand: "Ez bi tevlîbûna xwe serbilind im. Ez bang li hemû ciwanan dikim ku tev li YPG'ê bibin."

Demhat Teh jî da zanîn ku komên çete di navbera gelan de fitne derdixist û ew jî ji bo parastina gelan tev li YPG'ê bûye. Şervanên bi navên Rêber Efrîn û Ebdilezîz Şêxo jî got ku danûstandinên şervanên YPG'ê gelek baş e û da zanîn ku ew bi rêgezên YPG'ê bawer in ku dê bikaribin şêniyan biparêzin. **HELEB - ANHA**

Gelo Tirkiye amadekariya êrîşa
Minbicê dike?

Hêzên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê rêya di navbera Minbic û Cerablusê de girt û tangên xwe anîn ser sînorê bakurê Minbicê.

Ajokarên wesayîtên sivîlan ên ku ji Cerablusê tên Minbicê, da zanîn ku komên çete yên girêdayî artêşa tirk rêya çûn û hatina wesayîtên sivîlan bi ser pira Sacûrê re ku di navbera Minbic û Cerablusê de ye, girtiye. Ajokaran diyar kir ku hêzên dagirker nahêlin sivîl derbasî Minbicê bibin. Hat zanîn ku artêşa tirk jî li ser çemê Sacûrê tangên xwe bi cih kirin. **MINBIC - ANHA**

Şervan sivîlan diparêzin

Pêşveçûna şervanên Xezeba Firatê ya li herêmê didome. Di vê çarçoveyê de şervan bi hezaran welatiyên herêmê rizgar dikin. Welatiyên herêmê jî ji bo rizgarkirinê kêfxweşiyên xwe anîn ziman

DILSOZ DILDAR / REQQA - ANHA

Tevî rewşa nebaş a hewayê jî şervanên Xezeba Firatê pêşveçûna xwe ya li herêma gundewarên Reqqayê didomînin. Di pêkanîna armanca xwe ya parastina sivîlan û rizgarkirina herêmê de şervan gav paşve naavêjin.

Bi destpêka Hemleya Xezeba Firatê re şervanan bi hezaran şêniyên gundewarên rojavayê Reqqayê ji çeteyan rizgar kirin. Şervanan bi vekirina koridora ewle gelek welatî li herêmên ewle bi cih kirin. Piştî ku şervan gundan ji mayînan paqij dikin jî şêniyên gundan careke din vedigerin warên xwe. Gelek welatî jî li kampa Eyn Îsayê tên bicihkirin û gelek jî li cem xizmên xwe dimînin.

KÊFXWEŞIYA MEZIN

Pêdiviyên jiyanî yên welatiyên herêmê jî ji hêla şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê ve tên pêşwazîkirin. Der barê mijarê de welatiyên koçber da zanîn ku ew ji ber komkujî û kiryarên dûrî nirxên mirovahiyê yên çeteyên DAIŞ'ê reviyane û wiha dibêjin: "Çavên me li rêya hatina şervanan bû. Em nikarin vê kêfxweşiyê biwesifînin. Cara yekemîn e ku em bayê azadiyê werdigirin."

DAXWAZA GEL

Welatiyên ku ber bi şervanan ve dihatin kêfxweşiya xwe ya ji bo rizgarkirina ji pençên çeteyan anî ziman û hêvî kir ku şervanên Xezeba Firatê gundên wan di nêziktirîn dem de rizgar bikin. Hêzên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê di destpêka hemleya rizgarkirina de da zanîn ku armanca wan rizgarkirina şêniyên Reqqayê ye û wan hemle li ser daxwaza şêniyan hat pêk aniye.

Herêmên dorpêçkirî
tên rizgarkirin

Baskên qonaxa duyemîn a Hemleya Xezeba Firatê ku baskê yekemîn ji gundê Qadiriyê û yê duyemîn jî ji Eyn Îsa hatibû destpêkirin, bi rizgarkirina gundê Kurmanco gihaştin hev. Bi vê yekê herêmeke bi qasî 550 km çargoşe ket doçpêra şervanan. Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê piştî ku gihaştin hev du bi armanca rizgarkirina vê herêma dorpêçkirî dest bi operasyonê kir. Hat zanîn ku ji destpêkirina operasyonê heta niha gelek gund hatine rizgarkirin. **REQQA - ANHA**

Tirkiyeyê malbata kiryarê Sûltanahmetê xelat kir!

SEYÎT EVRAN / MINBIC - ANF

Malbata çeteyên DAIŞ'ê ku xwe li Sûltanahmetê teqandibû, di rêveberiya 'Meclisa Cerablusê' de ku Tirkiyeyê ava kiriye, cih digire. Tirkiyeyê bi vê yekê malbata kujer xelat kiriye.

Yek ji malbatên herî bingehîn a Cerablus û Minbicê jî malbata Fadlî ya li Amarniyê ye. 4 kurên rûspiyê malbatê Abid Abdullatîf (Ebu Şahab) di nav çeteyên DAIŞ'ê de ne.

KIRYARÊ KOMKUJIYÊ

Kurê Abid Abdullatîf ê bi navê Nebil Fadlî di 12'ê çileya 2016'an de li Taksîma Stenbolê êrîşa xwekujiyê pêk anîbû û 11 kes qetil kiribûn. Abdullatîf yek ji dewlemendên herêmê ye û yek ji kadroyên Birayên Misilman e. Kurê wî Mihemed di êrîşa balafirgeha Kuvayrs a li Hafirê de, Îbrahîm jî di şerê li dijî hêzên şoreşger de hatiye kuştin. Kurê wî Memdûh jî niha di nava DAIŞ'ê de ye.

Abdullatîf û kurê xwe yê mezin hê li Armaniyê ne.

BERPIRSÊ TIRKIYEYÊ!

Birayên Abdil Abdullatîf ên bi navên Adil, Îbrahîm û Memdûh Fadlî jî di nav DAIŞ'ê de li Minbicê wezîfeyên payebilind hilgirtine. Ji van birayan Adil û Îbrahîm li Cerablusê di saziya qaşo polîsan a Tirkiyeyê de û Memduh jî di rêveberiya qaşo meclisa sivîl de cih digirin. Minbicî dibêjin ku kiryarê Taksîmê Nebîl Fedlî di serî de tev li komên Artêşa Azad piştre Ehrar El Şam û herî dawî jî tev li DAIŞ'ê bûye.

Gelek malbatên bibandor ên li herêmê tev li komên çete bûn. Niha gelek kes û malbatên ku li herêmê binandor li gel Tirkiyeyê herêmên bakurê Sûriyeyê dagir dikin. Dewleta tirk jî ji bo bikaranîna van kesan nêzikatiyeke germ nîşan dide.

Gihandina her du baskan girîng e

Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê da zanîn ku gihandina her du baskan gaveke girîng e û rêya rizgarkirina bajaroka Tebqayê hêsan dike.

Şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê di encama pevçûnên dijwar de gundên Kurmano û Hiwêj ên Reqqayê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin. Bi rizgarkirina van gundan re êdî rêya rizgarkirina bajaroka Tebqayê hêsan dibe û tevî 45 gundan, 20 mezra jî xistin dorpêçê. Der barê mijarê de şervanê bi navê Şiyar Elî got ku hêzên wan piştî pevçûnên dijwar çete xistine dorpêçê û wiha dom kir: "Ev yek piştî berxwedaneke bêhempa pêk hat. Bi vê yekê re xetên me yên parastinê hatin avakirin."

Şervanê bi navê Ebûd El Ehmed jî bi lêv kir ku şêniyên Tebqayê li benda şervanan in û wiha pê de çû: "Gelê herêmê jî dixwaze di rizgarkirina Tebqayê de cih bigire. Bi rizgarkirina her du gundan êdî em 28 km'yan nêzî Reqqayê bûn." **REQQA - ANHA**

Li dijî hişmendiya paşverû çareseriya guncaw

Nûner û kesayetên navdar ên muxalefeta Sûriyeyê diyar kir ku encax sîstema federaliya demokratîk bikare rê li pêşiya çarenûsa parçekirinê ku Sûriye ber bi wê ve diçe, bigire.

Der barê mijarê de yek ji muxalîfên Sûriyeyê Riyad Dirar diyar kir ku alternatîfa dewleta navendî, avakirina sîstemeke nenavendî ye û wiha domand: "Tenê federaliya demokratîk dikare Sûriyeyê ji parçebûnê rizgar bike. Divê ku sîstema nû tê avakirin azadî, mafên bingehîn û edaletê di nav hemû pêkhate û tevna civakî ya Sûriyeyê de biparêze. Divê hikumeta nû bi rêya hilbijartinên paqij biguhere."

Endama Desteya Niştimanî ya Erebî Nîmet Axa jî got ku encamnameya meclisa damezirîner tekane rêya çareseriya aloziya Sûriyeyê ye. Endamê Desteya Siyasî ya MSD'ê Dr.Elî El Başa jî got ku li Sûriyeyê jiyana hevbeş a di navbera gelan de, ji ber hişmendiyên paşverû û tolgirtî ji holê rabûye û wiha bi dawî kir: "Lê pêla paşverû rastî hêzên demokratîk hat û ev hêz niha pêşeroja Sûriyeyê ava dikin." **QAMIŞLO - ANHA**

ROJEVA Medya
13 Çile 2017 În

HATAY

Rojnameger Taşkin hat girtin

Xebatkara Rojnameya Hatay Ses Ceren Taşkin ku bi îdiaya "propaganda rêxistinê kiriye" hatibû binçavkirin, hat girtin. Taşkin ku dozger îfadeya wê girt, bi hinceta di medyaya civakî de "propagandaya rêxistinê kiriye" bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê kir. Dadger jî bi heman hincetê biryara girtinê da û ew şand girtîgehê. Li gel Taşkin, hevseroka Partiya Rizgariya Jinûve ya Sosyalist (SYKP) a Hatayê Hulya Kavuk jî di nav de 16 kes serbest hatin berdan û dozger li dijî vê yekê îtîraz kir.

STENBOL

Çapemeniyê Bozdag derewand

Di nîqaşên guhertina qanûna bingehîn de parlamenterên CHP'ê di guhertina madeya 4'emîn de der barê rojnamegerên girtî de pirsek kir û li ser vê yekê bersiva Wezîrê Dadê Bekîr Bozdag "tu kesên ku ji ber rojnamegerî kirine hatine girtin, tune ne" ji aliyê rêxistinên çapemeniyê yên neteweyî û navneteweyî ve hat derewandin. CPJ û RSF'ê da zanîn ku di lîsteya rojnamegerên girtî de Tirkiye yekemîn e.

STENBOL

Dolar û euro roj bi roj zêde dibin

Dolar û euro roj bi roj li hemberî TL zêde dibin. Kura dolar ku duh bi 3.94 TL bi dawî bû, piştî daxuyaniya serokdewletê DYA'ê pêlekê daket. Dolar ku li hemberî pereyên cîhanê qîmeta wî daket, li hemberî TL zêde dibe. Serê sibê bi 3.8640 TL dest bi rojê kir û piştî saet 09:52'an dolar li hemberî TL gihaşt 3.92'an. Euro jî rekor şikand. Euro ku 4 hezar TL derbas kir, serê sibê bi 4.15'an dest pê kir, piştî saet 09:52'an gihaşt 4.1742 TL.

EDENE/ OSMANIYE

Gelek kes hatin binçavkirin

Li Osmaniyeyê duh di serdegirtinên malan de hevserokên HDP'ê yên Osmaniyeyê jî di nav de gelek kes hatin binçavkirin. Li Osmaniyeyê hevserokên HDP'a Osmaniyeyê Behiye Tan û Yuksel Teçîk jî di nav de gelek kes hatin binçavkirin. Li Edeneyê jî bi şev polîsan bi ser mala Sedat Emen ê li taxa Karaoglan a navçeya Yuregîrê de girtin. Piştî lêgerînê Emen hate binçavkirin.

'Nîqaşa li Meclisê bê wate ye'

Li meclisa tirk di dengdayîna ji bo madeyên makeqanûna nû ya ku dîktatoriya Erdogan xurt bike di navbera AKP û CHP'ê de nîqaş pêk tên. Erdogan got ku ew ê vê makeqanûnê teqez bînin pêşberî gel

Ev çend roj in ku nîqaşên makeqanûna ji bo dîktatoriya Erdogan hatibû amadekirin, li Meclisê tê nîqaşkirin, di navbera wekîlên AKP û CHP'ê de êrîşên fîzîkî jî pêk tên. Serokwezîr Bînalî Yildirim, wezîr û wekîlên AKP'ê dengê xwe vekirî bi kar tînin û li gorî makeqanûnê tev nagerin. Li dijî vê yekê jî wekîlên CHP'ê bertekan nîşan didin.

Serokwekîlê Koma CHP'ê Ozgur Ozel serdana Bînalî Yildirim ku du roj berê çûbû kulîsa CHP'ê û bi Kiliçdaroglu re sohbet kiribû bi bîr xist û got ku yên hatin çaya me vexwarin, ji bo xwîna wan bixwin hatine.

Serokomar Recep Tayyip Erdogan jî ku li qesra serokomariyê di civîna 34'an de bi keyayan re hat cem hev û li ser nîqaşên Qanûna Bingehîn rawestiya û diyar kir ku zû dereng ev pêşniyarnameya Qanûna Bingehîn dê di meclisê re derbas bibe û bê pêşberî gel û wiha got: "Tu hewldanên li meclisê dê kêrî tiştekî neyên. Ne 15 roj mehek be jî dê ev qanûn derbas bibe û bê pêşberî gel."

Erdogan têkildarî rewşa aborî jî wiha got: "Dixwazin bi aboriyê êrîşî Tirkiyeyê bikin. Em dizanin aboriyê wekî çek bi kar tînin. Bila baş bizanin ku terorîstên di destê wan de çek heye û terorîstên di destê wan de dolar û euro heye tu cudahiya wan ji hev tune ye. Kura dowîzê wek çek bi kar tînin." ***AMED - DÎHABER***

Wateya peyvê nemaye

67'emîn rûniştina doza 156 siyasetmedarên kurd a Doza Sereke ya KCK'ê ku di sala 2009'an de dest pê kir û Hevserokên KCD'ê Hatip Dicle, Leyla Guven, Hevserokê DBP'e Kamuran Yuksek û hevşaredarê girtî Firat Anli û Ahmet Turk jî di navde tên darizandin, li 2'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin.

Di rûniştina dozê de Endamên Meclîsa DBP'ê Turan Genç, Pero Dundar, Çimen Işik, Olcay Kanlibaş û Rêveberê DBP yê Amedê Celal Yoldaş yên girtî tên darizandin amade bûn. Dîsa parêzerên siyasetmedaran ji amade bûn. Di rûniştinê de Ahmet Turk ji ber rewşa xwe ya tenduristiyê nekarîbû beşdarî dozê bibe.

Endame Meclîsa DBP'ê Olcay Kanlibaş parastina xwe bi kurdî kir û diyar kir ku îdîanameya ji aliyê cemaeta Gulen ve hatiye amadekirin hilweşiya ye û êdî di Doza KCK'ê de tu wateya gotinê nemaye. Endama Meclisa DBP'ê ya berê Pero Dundar jî anî ziman ku tawanbariya li hemberî wan li dijî rastiyê ye û wiha got: "Tiştekî rast heye ew jî rastiya min û rastiya gel tê înkarkirin. Rastiyek din jî nasnameya min a kurd, nasnameyamin a jinê û nasnameya min a elewîtiyê tê înkarkirin." ***AMED***

Meclîs erê bike jî gel erê nake

Hevserokê DBP'ê Kamuran Yuksek, Cîgira Hevserokan a DBP'ê Gulcihan Şîmşek, Endamê Lijneya Giştî HDP'ê û Hevşaredarên ku ji peyvirê hatine girtin Hevşaredarên DBP'ê li gel endamên çapemeniyê li Amedê di civîna taştê de hatin cem hev.

Kamuran Yuksek, diyar kir ku di pêvajoya OHAL'ê ku siyasetmedar û parlamenter girtî ne de sazkirina Qanûna Bingehîn ne rast e û wiha got: "Guhertina Qanûna Bingehin di meclîsê re derbas bibe û bê erêkirin jî gel vê yekê erê nake û di referandumê de 'Erê" dernakeve. Gel dê di referandumê de ji AKP'ê re bêje 'Raweste'. Em armanc dikin ku di demek nêzîk de Kongreya Yekitiya Neteweyi pêk bînin. Birêz Ocalan berê gotibû 'Ger hikûmet amade be dikarim di 6 mehan de çareser bikim."

Gulcihan Şimşek jî anî ziman sedema rewşa Tirkiye ya niha têde pirsgirêka siyasî ye û wiha got: "Li welatê ku azadî lê tune be krîz heye. Tirkiye kriza qanuna bingehîn dijî. Qanûna Bingehîn ji azadiya jinê û azadiya ramanê dûr e. Di vê qanûna nû de cihê jinê tune û jin ji qanûna bingehîn têne dûrxistin. " ***AMED***

Bînçavkirin veguherî înfazê

Di çarçoveya lêpirsîna ku navenda wê Stenbol e de, di 25'ê Kanûna 2016'an de rojnamger Omer Çelik, Metin Yoksu, Derya Okatan, Mahir Kanaat û Eray Saygin, 20 roj in di bin çavan de tên ragirtin.

Rojnamgerên bi îdiaya "Endamên rêxistinê" hatin binçavkirin, nayê zanîn ku bi çi tên tawanbarkirin. Her wiha têkildarî rojnamegeran, heta niha tu delîl jî teblîxî parêzeran nehatiye kirin.

Ji rojnamgerên hatine binçavkirin Derya Okatan, ketibû gireva birçîbûnê û hîn jî girev didome. Hat diyarkirin ku, vîtamîna B1'ê didin Okatan û her diçe zihîf dibe.

Parêzer Ozcan Kiliç, binçavkirina rojnamgeran wek "binçavkirineke tewşomewşo" şîrove kir û anî ziman ku, biryara binçavkirinê, biryareke derhuqûqî ye.

Kiliç biryara binçavkirina 30 rojan jî wiha nirxand: "Dixwazin delîlên di dest wan de tune ne biafirînin." Parêzer Sezin Uçar dest nîşan kir ku, 20 roj e rojnameger di bin çavan de tên ragirtin û ev veguheriye înfazê. STENBOL

Ji Bahçelî daxuyaniya balkêş

Serokê Giştî yê MHP'ê Devlet Bahçelî, di dema domandina hevdîtinên guherandina Qanûna Bingehîn de, li kulîsê pirsên rojnamegeran bersivandin. Bahçelî der barê hevşaredarê Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê Ahmet Turk de daxuyaniyên balkêş dan.

Bahçelî wiha got: "Heke pêşniyar derbas nebe, divê meclis ji serî ve bê nûkirin. Di hevdîtinan de stratejiya rageşiyê tê şopandin, divê wisa nedome. Heke wisa bidome, dibe ku berbelavî Tirkiyeyê bibe. Di dengdayînê de, ez ne li benda ketin û daketinên jinişkave me. Divê bi mercekê li fîreyê bê gerîn. Divê Ahmet Turk bêyî bê girtin bê darizandin." ENQERE

Ji çareseriyê dûr ketine

Baroya Amedê têkildarî hevdîtinên ku ji bo guhertina qanûna bingehîn a pêşiya serokomariya partiyî vedike li avahiya Alîkariya Edlî ya Baroyê civîna çapemeniyê li dar xist. Daxuyanî ji aliyê Serokê Baroya Amedê Ahmet Ozmen ve hat xwend. Ozmen got ku bi beşdariya hemû partî û rêxistinên civakî yên sivîl li ser esasê mafên mirovan, gerdûnî û hemû cudabûn û dewlemendiyan pêvajoyeke qanûna bingehîn bê destpêkirin û banga paşvekişandina pêşnûmeya guhertina qanûna bingehîn a ku li Meclisê tê nîqaşkirin, kir. AMED

www.arsiv.com

ROJEVA Medya
13 Çile 2017 În

Ciwan dê biçin Qendîlê

Ciwanên devera Raperîn diyar kir ku dê îro biçin Qendîlê û daxwaz ji ciwanên başûrê Kurdistanê kir ku piştgiriya helwesta Pêşmergeyên Dêrîn bikin ku hefteya derbasbûyî çûbûn Qendîlê

ELÎ QADİR / RANYE

Li Başûrê Kurdistanê beriya demekê Pêşmergeyên Dêrîn ên Herêma Kurdistanê çûbûn Qendilê û pişgtiriya xwe ji bo hêzên gêrîla nîşan dabû.

Ciwanên devera Raperîn li baxçeyê giştî yê bajarokê Ranye yê bi ser Rêveberiya Raperînê ve daxuyaniyek da çapemeniyê û ragihand ku dê îro ji bo ku piştgiriyê bidin helwesta Pêşmergeyên Dêrîn dê biçin Qendîlê.

Di daxuyaniya ciwanan de wiha hat gotin: "Em daxwaz ji ciwanên başûrê Kurdistanê dikin ku li dijî planên dewleta dagirker a tirk û hevkarên wê yên navxweyî, piştgiriya pêşmerge û gerîlayan bikin. Bi vê boneyê sibê (îro) saet 09:30'an de li bajarokê Kilkey Kolên ya Raperîn kom bibin û ber bi Qendilê ve em ê bi rê bikevin."

Nûnerê Ciwanan Siyako Hisên axivî û wiha got: "Dijminên gelê kurd ên dagirker dixwazin bi plan û dagirkeriyê gelê kurd têk bibin. Bi taybet dewleta tirk a dagirker li dijî gelê me di nava planan de ye û niha jî dixwaze bi alîkariya çend aliyên başûrê Kurdistanê êrîş bike ser gerîla li Şengal, Qendîl û herêma Behdînan."

Siyako Hisên wiha pê de çû: "Ji ber wê em li vir piştgiriya xwe ji bo gerîla dubare dikin û radigihînin. Em amade ne li beramberî hemû êrîş û planên li dijî gerîla û gelê me were kirin rawestin." Di dawiya axaftina xwe de Nûnerê Ciwanan Siyako Hisên wiha got: "Em pişgtiriya Pêşmergeyên Dêrîn girîng dibînin û piştgiriya wan dikin. Her wiha ji bo şikestina van lanên dijminên dagirker daxwaz ji hemû ciwanan dikin ku bê deng nemînin û piştgiriya hêzên gêrîla bikin."

Hêjayî gotinê ye ku roja 6'ê çileya 2017'an bi sedan Pêşmergeyên Dêrîn ên Herêma Kurdistanê çûbûn Qendîlê û piştgiriya xwe ji bo hêzên gêrîla nîşan dabû.

Ji bo Yuksekdag cezayê muebetê

Serdozgeriya Komarê ya Wanê, lêpirsîna xwe ya der barê axaftinên hevseroka HDP'ê Fîgen Yuksekdag ên di 11'ê Nîsana 2015, 30'ê Kanûna 2015 û 5'ê Adara 2016'an de temam kir.

Di îdîanameya ku ji aliyê 2'yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Wanê ve hat qebûlkirin de hat diyarkirin ku ji ber naveroka axaftinan giliyên ji Serdozgeriya Komarê ya Yalovayê re hatine kirin lêpirsîn hatiye vekirin. Di îdianameyê de der barê Yuksekdag de ji ber sûcên "yekitiya dewlet û hevgiritna civakê xira kiriye" û "propagandaya rêxistinê kiriye" cezayê muebetê yê girankirî û 7 û nîv sal cezayê girtîgehê tê xwestin. WAN



Doza Demîrtaş talog kirin

Yekemîn rûniştani doza hevserokê HDP'ê Selahattîn Demîrtaş ku girtî tê darizandin û di 9'ê îlona 2015'an de ji ber daxuyanike çapemeniyê bi sûcdariya "Heqaret li Hikumeta Komara Tirkiyeyê kiriye" hat vekirin û 2 sal ceza tê xwestin, li 2'yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hat dîtin. Demîrtaş ku li Girtîgeha Tîpa F a Edîrneyê girtî ye tev li dozê nebû. Daxwaza parêzeran a rawestandina darizandinê hat redkirin. Ji bo ku Demîrtaş bi SEGBÎS'ê tev lê bibe, doz taloqî Adarê hat kirin. AMED

Ji partiyên kurd bangewazî

Partiyên kurdistanî yên li Amedê bal kişand ser girîngiya Kongreya Netewî ya Kurd û got di serdemeke wisa krîtîk de ji bo kombûn û pêkanîna kongreyê divê her kes peywira dikeve ser milê wan bi cih bîne.

Endamê Lijneya Birêvebirina Navendî ya Partiya Azadiya Kurdistan (PAK) Vahit Aba, anî ziman ku di vê serdemê de beriya her tiştî pêdiviya gelê kurd bi yekitiyê heye û got, divê di sed-sala 21'emîn de gelê kurd bi bîra netewî, xwe bigihîne maf û azadiyên xwe.

Berdevkê Tevgera Azadî Sedat Dogan jî bal kişand ser şerê li Rojhilata Navîn û got piraniya vî şerî li ser erdnîgariya kurdan pêk tê. Dogan diyar kir ku ji bo gelê kurd di nêvenga şerî de li hemberî polîtîkayên serdestan têk neçe, careke din pêrgî qetlîaman, îxanetan û koçberiyê neyê divê hêza xwe bike yek û got ji ber vê ew girîngiyê didin kongreyeke ku her kes xwe tê de bibîne.

Serokê Giştî yê HAK-PAR'ê Refik Karakoç anî ziman ku yekitiya kurdan pir girîng e û got, divê li her çar parçeyan bangên yekitiyê û kombûna Kongreya Netewî bê kirin. Karakoç got, ew di wê baweriyê de ye ku ji bo kombûna kongreyê şert û merc kamil bûne û anî ziman ku kongre gelekî girîng e, lê belê hîn jî di nav rêxistinan de pirgirêkên cidî hene. ***AMED***

Refik Karakoç

Sedat Dogan

Vahît Aba

Êzidî naxwazin PKK ji Şengalê derkeve

SELAMÎ ASLAN – ENQERE - DÎHABER

Di demên dawîn de, ji aliyê rayedarên PDK'ê ve daxuyaniyên ku bila PKK ji Şengalê derkeve tên dayîn û herî dawî Nêçîrvan Barzanî gefa "Em ê hêzê bi kar bînin" xwaribû. Piştre Buroya Dîplomasiyê ya KCK'ê daxuyandibû ku tu biryareke PKK'ê ya bi vî rengî tune ye.

Têkildarî mijarê Serokê Federasyona Êzidiyên Almanyayê Zerdeşt Gunay li dijî daxwazên PDK'ê bertek nîşan da. Gunay anî ziman ku kesên ku êzidî terkî mirinê kirin mafê wan nîn e biaxivin. Gunay da zanîn ku êzidî PKK'ê wek rizgarker dibînin û wiha got: "Heke PKK ji Şengalê derkeve, dê mafê me yê jiyanê neyê hesibandin." Gunay anî ziman ku, PKK hêza parastina gelê kurd e û got, YBŞ jî ji keç û xortên ciwan ên civaka êzidî pêk tê. Gunay anî ziman ku mîna dema li dijî herêmên wekî Silêmaniye û Kerkukê tiştek biqewime, YPŞ ji bo parastina van herêman jî amade ye û got, divê kurd ji ber vê hêzê kêfxweş bin. Gunay wiha pirsî: "Çima naxwazin? Ditirsin ku êzidî bibin xwedî hêzek. PDK, naxwaze êzidî bibin xwedî hêz." Gunay anî ziman ku, dê civaka êzidiyên Şengaleke bêyî PKK'ê qebûl neke û got, divê siyaseta Başûr xwe ji bin sîwana Tirkiyeyê derxe. Gunay destnîşan kir ku ji ber polîtîkayên PDK'ê kongreya neteweyî nayê lidarxistin.

PJAK çû serdana PDK-Î'yê

Her du partiyên Rojhilatê Kurdistanê Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) û Partiya Demokratîk a Kurdistanê-Îranê li Koyê kom bûn.

Hevserokê PJAK'ê Siyamend Muhenî û şandeya partiya wî serdana baregeha navendî ya Partiya Demokratîk a Kurdistanê-Îranê (PDK-Î) li Koyê kirin. Şande ji aliyê Cigîrê Sekreterê Giştî yê PDK-Î Mustafa Mewlûdî ve hat pêşwazîkirin.

Di hevdîtinê de hevserokê PJAK'ê Siyamend Muhenî qala krîzên li Rojhilata Navîn kir û bal kêşa ser girîngiya yekitî û hevgirtina her çar parçeyên Kurdistanê û bi taybet aliyên Rojhilatê Kurdistanê. Muhenî bal kêşa ser bi hev re karkirin û têkoşîna hevbeş ji bo pêkanîna Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê û bi bîr xist ku divê di vê qonaxê de erkê xwe yê dîrokî bi cih bînin. Cigîrê Sekreterê Giştî yê PDK-Î Mustafa Mewlûdî ji li ser yekrêzî û yekitiya aliyên kurdan axivî û got ku li ber yekitiya kurdan astengiya mezin berjewendiyên partiyan in.

SILÊMANÎ

Şêniyên Şêxmeqsûd ji bo azadiya Ocalan meşiyan

Çalakiya greva birçîbûnê ku TEV-DEM`ê bi armanca şermezarkirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan li taxa Şêxmeqsûd li dar xistibû bi meşekê bi dawî bû.

Bi sedan pêkhateyên Şêxmeqsûd li ber Navenda Saziya Malbatên Şehîdan kom bûn û tev li greva birçîbûnê ya ji bo azadiya Ocalan hate lidarxistin bûn. Welatiyan di dawiya çalakiya xwe de meşek li dar xist. Hêjayî bibîrxistinê ye ku ji ber topbaran û êrîşên çeteyan ên li ser taxê, şêniyên Şêxmeqsûd meş û kombûn li dar nedixistin. Lê piştî derketina çeteyan ji rojhilatê Helebê, şêniyên Şêxmeqsûd careke din dest bi meşan kir. Beriya destpêkirina meşê daxuyanî hat dayîn û hat gotin ku dê heta azadiya Ocalan û hemû girtiyên siyasî li ber xwe bidin. Meş bi dûrişmên şermezarkirina tecrîdê bi dawî bû. **HELEB**

ROJEVA Medya
13 Çile 2017 În

NAVENDA NÛÇEYAN

Karaktera desthilatdariya hegemonîk a AKP'ê

Tercîha AKP'ê û pêşeroja Tirkiyeyê

RÊBERÊ GELÊ KURD Abdullah Ocalan pêşbîniya xwe ya der barê tercîha hikumeta AKP'ê û şirîkên wê de jî wiha şîrove dike: *"Di qonaxa li pêşiya me de Komara Tirkiyeyê wê tam bê serê duriyan. Komara di qonaxa rizgariyê de ingilîzan berê wê da şerê antî-kurd, mixabin dîsa Ingilistan û hevgirtiyê wê yê sereke DYA wê berê wê bidin şerê antî-kurd û vê carê wê bêhtir tengav bibe. Jixwe sih salên dawî yê vê Komara Duyemîn di vê tengaviyê de derbas dibin. Komar di vê tengavbûnê de diperpite. Bûyerên diqewimin, ne bi tenê 'şerê di asta jêr de' ye; nirxên civakî heta bi şaneyan ji hev dûr dikevin û dirizin. Ji têgînên hilweşînê û jihevdeketinê gelekî girantir jihevbelavbûn û rizîneke civakî pêk hat. Îradeya xwe wekî organîzasyoneke Gladîo dimeşîne pêkan e ku bibe rejîmeke tarî, lê tu carî nabe rejîmeke komarê. Di şer de israr dibe ku pêngava dawî ya Gladîo'yê be, lê ji bo bêtesîrkirinê têrê dike ku ji odeya kozmîk bê derxistin û zelalkirin."*

Ocalan têkildarî rêya duyemîn jî destnîşan dike ku ew rê, rêya yekitiya demokratîk e ku di dema Şerê Rizgariya Neteweyî de pêk hatibû û destnîşan dike ku AKP dikare vê rêyê careke din bike bingeha komarê. Lê belê ji sala 2015'an û vir ve polîtîka û pratîkên AKP'ê destnîşan dikin ku ew rêya yekemîn ji bo xwe hilbijartiye.

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di dahûrandinên xwe de balê dikişîne ser karaktera AKP'ê ya ji bo gel, bîr û baweriyan xeternak û destnîşan dike ku AKP hegemonyaya xwe di ser tunekirina kurdan re didomîne

Ocalan diyar dike ku mirov dikare AKP'ê wek bisazîbûna îdeolojîk, polîtîk, ekonomîk û çandî ya rejîma 12'ê Îlonê binirxîne û vê analîzê dike: *"CHP'ya Komara Yekemîn çi be, AKP'ya 12'ê Îlonê ya Komara Duyemîn jî ew e. AKP dixwaze desthilatdariya xwe ya hegemonîk bi Destûra Bingehîn (ya rastî, versiyoneke lîberal a Destûra Bingehîn a 12'ê Îlonê ye) tacîdar bike. Armanca bingehîn a hilbijartinên 2011'an ev e."*

Nêzîkatiya AKP'ê ya li dijî kurdan

Îcar têkiliya AKP û kurdan çawa ye û AKP çawa nêzî kurdan dibe? Têkildarî mijarê Ocalan vê tespîtê dike: *"Polîtîkayên hegemonyaya AKP'ê der barê kurdan de ji yên hegemonyaya CHP'ê cuda nîn in. Ger her du partî jî wekî berê nikaribin polîtîkayên îmha û înkarê bimeşînin, di bingehê vê de têkoşîna PKK'ê ya nayê tepisandin, heye. Nexwe bi wan bimîne, di îmhakirin û înkarkirina kurdan de wê ji CHP'ê kêmtir nemînin. Heta ji hin aliyên din ve, nexasim di warê fanatîkiya îdeolojiya dîndar de (çawa ku di mînaka Hîzbul-Kontra de hat dîtin) ji CHP'ê hostetir e... Dîsa bi awayekî bingehîn hêza pêşî li çareseriya siyasî ya di nava dewletê de digire AKP ye. Meyla çareseriyê ya dewletê ji bo pêşdebirina hegemonyaya xwe bi kar tîne. Hem naveroka vê meylê ji cidiyetê dûr dike, hem di propagandaya xwe de bi kar tîne, hem jî nava wê pûç dike. Bi vî aliyê xwe ji MHP û CHP'ya helwestên wan aşkera, bi talûketir dibe."*

Mafên ferdî û çandî yên AKP'ê tên çi wateyê?

Ocalan diyar dike ku ji bo tepisandina meseleya kurd cara pêşî di dema AKP'ê de ev qasî berfireh û bi îlan bi artêşê re li hev hatiye kirin û mijarê wiha dinirxîne: *"Di vê polîtîkayê de yek ji têgînên kilît 'mafên ferdî û çandî' ne. Ev bi xwe di bin navê çareseriya pirsgirêka kurd de maskekirin e ji bo pêkanîn û planên tesfiyekirina nasnameya azad û kolektîf a kurd. Piştî ku tesfiyekariya 2002-2004'an hat pûçkirin, çareseriya bi navê 'mafên ferdî û çandî' li dijî çareseriya KCK'ê bi beşê artêşê yê fermandariyê re bi desteka DYA, YE û rêveberiya kurd û ereb a Iraqê (wekî din, tevî Îran û Sûriyeyê hevgirtineke din a destekdar xistin dewreyê) ji 2005'an ve xistin dewreyê. Bi gotina Serokwezîr R. Tayyip Erdogan 'li dijî terorê ji aliyê leşkerî, polîtîk, ekonomîk, çandî, dîplomatîk û psîkolojîk ve têkoşîn û seferberiyeke topyekûn' dest pê kirin."*

Şerê topyekûn ê AKP'ê

Ocalan ji bo şerûdiya AKP'ê û şerê li dijî kurdan dide meşandin jî di dahurandinên xwe de ev tespît kiriye: *"Hikumeta AKP'ê xwe xist bin berpirsyariya şerekî ku tu hikumetê bi qasî wê newêrîbû vê bike ango hikumeta AKP'ê Gladîoya xwe pêk anî û bi wê şerê xwe dimeşîne (Dema Pêncan a Şerê Gladîo). AKP dev ji şer berneda; şer pirralî û berfireh kir, ango şer hûr û kûr dimeşîne. AKP ji partiyên dewletê yên beriya xwe bêhtir partiya dewletê ye, hikumeta wê jî ji tevahî hikumetên beriya xwe bêhtir hikumeta 'şerê taybet' e. Ji rêxistina tetikêş Hîzbûllahê ya bi ser JITEM'ê ve berfirehtir li pey rêxistiniyeke kontra ya îslamî ye. Di serî de îmamên kadro yên Diyanetê endamên cemiyetên gelek terîqetan bi rêxistineke ban û sîwanê ya şêwazê Hamasê bi pirrarmancan bi kar tîne. Kontrola xwe ya li ser ekonomiyê di xizmeta şerê taybet de dimeşîne. Çanda jiyana dînî bi heman armancê dinirxîne. Bi giranî navenda dîplomasiyê di heman warî de dixebitîne. Bi kurtî, di navenda xebatên hikumetê de tesfiyekirina Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd heye. Hikumeta AKP'ê ne bi tenê gav bi gav desthilatdariya dewletê dixe destê xwe, di heman demê de hegemonîze dike. Mîna di dema dameziran-dina komarê de, di pêvajoya hilweşîna wê de jî dixwaze desthilatdariyê hegemonîze bike û bidomîne. Tevgera tesfiyeyê ya li dijî kurdan çawa ber bi hegemonya faşîst a tirkê spî ve çû, di pêvajoya jihevdeketina faşîzmê de jî tevgera nasnameya kurd a azad dikin hedef û bi vî awayî dixwazin heman hegemonyayê ji nû ve ava bikin."*

www.arsiv.rojevamedya.com

AMED & Huner
13 Çile 2017 În

Kovara Çirûsk bi hejmara 29'an derket

KOVARA HUNERÎ û ramanî Çirûsk bi hejmara xwe ya 29'an ya mehên çile, sibat, nîsan û adarê derket. Di kovarê de nivîsên hunerî, wêjeyî, felsefî, civakî û entelektuelî hene. Kovara Çirûsk çar mehan carekê ji hêla weşanxaneya Belkiyê ve li Amedê tê çapkirin. Di hejmara nû de gelek nivîs cih digirin û nivîsên Bibîranîna Birînekê (Burhan Tek), Hûka Helbestê (Cemîl Denlî), Destpêkek Ji Bo Ergatîfiyê (Lokman Koçhan), Dîroka Sînemayên Welatên Cîhanê (Dilazad Art), Li Ser Pirtûka 'Ji Nav Sînor' (Emre Zeytînoglu), Nanê Êvarê (Îsabella Bêrîvan), Kitêba Bergsor (Ferhadê Mihemed), Defterek (Ferec Koyistanî) û her wiha hevpeyvîna bi Janez Sar re di nav rûpelên kovarê de cihê xwe girtiye . **AMED**

'Çavên min tune bin jî dengê min heye'

Welatiyê bi navê Ayhan Tekirbaş (26), li Agiriyê dimîne û astengdarê çavan e. Takirbaş jî wek gelek hunermendên kurd bi çanda dengbêjiyê re eleqedar e. Tekirbaş bal kişand ser girîngiya dengbêjiyê û destnîşan kir ku ew bi kilaman mezin bûye.

Tekirbaş aşkera kir ku çanda dengbêjiyê ji kalê wî derbasî bavê wî, ji bavê wî jî derbasî wî bûye û diyar kir ku ew ê jî vê mîrateyê ji keça xwe re bihêle. Tekirbaş anî ziman ku ji 15 saliya xwe ve ew bi dengbêjiyê re eleqedar e û wiha got: "Keçeke min heye, ez wê bi kilaman mezin dikim. Dê keça min jî vê mîrateyê ragihîne nivşên pêy xwe. Ev dîrok, çand, ziman ê me ye. Em xwedî li zimanê xwe derkevin."

Dengbêjê ciwan Ayhan Tekirbaş dibêje: "Dibe ku çavên min tune bin, lê dengê min heye. Ez bi dengê xwe ruhekî li kilaman peyda dikim û xwe digihînim mirovan. Bi dengê xwe jiyanê dibînim."

Tekirbaş da zanîn ku nedîtina wî li pêş dengbêjiyê nabe asteng û wiha axivî: "Roja ku ez hatime dinê heta niha, astengdarê dîtinê me. Dibe ku çavên min tune bin, lê dengê min heye. Ez bi dengê xwe ruhekî li kilaman peyda dikim û xwe digihînim mirovan. Bi dengê xwe jiyanê dibînim. Dema distrêm kelecanek xwe li min dipêçe. Çimkî di her kilamê de hîn bêtir çanda me û dîroka me fêm dikim. Ji kilaman hînî dîrok û zimanê xwe bûm."

Tekirbaş aşkera kir ku ji ber ew êş û azarên li cîhanê nabîne bextewar e û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Her roj dibihîzim ku bi dehan mirov tên kuştin. Ez li wê niheqiya ku li mirovan tê dibihîsim. Dibihîsim xwîna mirovên hêj dirije. Ev bihîstin jî min diqehirîne, lê nizanim heke min ev tişt bidîtanan, minê çawa îdare bikira. Carinan dibêjim başe ku ez nabînim. Ji ber ku ez vê zilm, neheqî û şerî nabînim, ez bextewar im."

AGIRÎ - DÎHABER

Drokpaî xwedî çandeke rengîn in

Li ser rûyê cîhana me gelek civakên xwedî çandên qedîm hene. Ji van civakan yek jî civaka drokpaî ye. Tê gotin ku ji civaka aryen a antîk tenê ew mane. Di tevahiya dîrokê de wan jî gelek êş û azarên dagirkeriyê kişandine û bi bandora çanda kozmopolîtîk a Hindistanê gelekî lê bûye û hema bêje wek civaka homojen a tekane tên dîtin. Çand û kevneşopiyên civaka drokpaî, gelekî nêzî çand û kevneşopiyên gelên Asyaya Navîn in. Ew jî wekî kurd, romen û çermsoran ji xeml û xêzê hez dikin. Di van xemlan de herî zêde nexşên kulîlkan derdikevin pêş. **AMED**

'Şimika bipanî şîr çêdike'

Lîstika bi navê 'Topuklu Terlîk Sut Yapar' (Şimika bipanî şîr çêdike) derdikeve pêşberî temaşevanan. Lîstik jiyana Fîgen Şakaci vedibêje. Lîstik ji hêla nivîskar Şakaci ve hatiye nivîsandin û ji romana 'Pala Hayriye' û ji çîroka 'Pîştî' sûd hatiye girtin. Lîstik li ser jiyana jineke ku temenê wê hatiye 40 saliyê û di navbera rolên zayendî û kesayetiyê de mayî disekine. Ev jin difikire ku bibe dayik an na û bi tu awayî nikare pêngavekê biavêje. Di kadroya lîstikê de Yeşîm Koçak, Durul Bazan, Alî Îl, Fusun Kostak, Îpek Turktan Kaynak û Mert Aykul cih digirin û dê di 19'ê mehê de li Navenda Pêşandan û Çandê ya Trump bê pêşandan. **STENBOL**

Bi 5 zimanan albumekê derdixe

Stranbêja ji rojavayê Kurdistanê Alîn, albumeke nû belav dike. Di albumê de bi 5 zimanan stranan dibêje, stranekê jî li ser serokê Îmaratê yê koçkirî Şêx Zaydî tê gotin. Alînê der barê albuma xwe de agahî da û aşkera kir ku albuma wê di demeke nêz de derdikeve û piştrast kir ku di albumê de 10 stran cih digirin û wiha got: "Stran bi zimanên kurdî, erebî, almanî, rûsî û suryanî hatin gotin." Alînê diyar kir ku ji bo gelên din jî bi huner û çanda kurdî agahdar bibin, wê bi zimanên cuda stran gotine û wiha pê de çû: "Niha beşeke mezin a albumê qediyaye û dê di demeke nêz de bê çapkirin." **HEWLÊR**

'Warê Firaran' û êşên Geliyê Zîlan

BÎLAL GULDEM / AMED - DÎHABER

Nivîskarê kurd Abdurrahman Bedîr ku demeke dirêj di girtîgehê de ma, nêzî 16 sal in li ser helbest, roman, çîrok û wêneyan dixebite, yekem car pirtûkeke kurdî ya helbestan a bi navê 'Xemzêm' derxist. Bedîr ji Geliyê Zîlan a Erdîşa Wanê ye, helbest û romanên xwe bi awayekî nû ku di wêjeya kurdî de bê bikaranîn bi şêwazê 'dengbêjwarî' pirtûkên xwe dinivîsîne.

Bedîr diyar dike ku ew bi êşa komkujiya Geliyê Zîlan mezin bûye, niha jî pirtûkeke bi navê 'Warê Firaran' bi şêwaza 'denbêjwarî' êşên Geliyê Zîlan bi bîr dixe. 'Warê Firaran' di heman demê de yek ji helbesteke ku di pirtûka 'Xemzêm' de ye. Bedîr piştî ku helbesta 'Warê Firaran' dinivîse, vê carê jî dest bi nivîsandina romana bi navê 'Warê Firaran' dike. Di vê pirtûkê de bi hemû awayî êş, keder û birîna nekewandî ya Geliyê Zîlan tê bibîrxistin û nemaze jî di romanê de li ser koçberiya Geliyê Zîlan disekine. Dê ev pirtûk heta çend mehan bigihîje ber destên xwendevanan.

Bedir destnîşan kir ku gotina 'Warê Firaran' hatiye jibîrkirin û wiha got: "Warê Firaran tê wateya koçberiyê." Bedir diyar kir ku komkujiya Geliyê Zîlan bandoreke mezin li ser derûniya wî kiriye û wî demeke dirêj komkujiya Geliyê Zîlan ji şahid an jî pîrên ji komkujiyê rizgar bûne guhdar kiriye.

ŞÊWAZA 'DENGBÊJWARÎ'

Bedîr destnîşan kir ku şêwaza 'dengbêjwarî' di wêjeya kurdî de cara yekemîn e tê bikaranîn û got ku ew bi romanê dixwaze çanda kurdan û komkujiya Geliyê Zîlan di bîra mirovan de zindî bike. Bedîr derbirî ku ew helbest û romanên xwe ne bi rêbaza ewropî çêdike, ew dixwaze bi şêwaza çanda denbêjiyê binivîse. Bedîr got ku rêbaza 'dengbêwarî' ji aliyê wî ve li wêjeya kurdî hatiye zêdekirin û hemû xebatên wî di vê çarçoveyê tên kirin.

Abdurrahman Bedîr KÎ YE?

ABDURRAHMAN BEDÎR li Geliyê Zîlan ê girêdayî Erdîşa Wanê di sala 1981'an de hatiye dinê. Bedîr di temenê xwe yê ciwan de dest bi xebatan dike, tê girtin û li girtîgeha Mûşê dimîne. Li wir li ser ziman dixebite, dinivîse, piştî ku tê berdan diçe Zanîngeha Stenbolê û li wir beşa derûnnasiyê dixwîne. Di serhildana Kobanê de tê girtin. Niha ew li Amedê dijî û li ser wêjeya kurdî xebatên xwe dimeşîne. Wî di sala 2014'an de pirtûkeke bi tirkî nivîsandiye û niha bi kurdî li pêşberî xwendevanan e.

Wê di 19'ê tîrmehê de koç kiribû

Îro 86'emîn rojbûna nivîskara jin Leyla Erbîl e. Erbîl berî 4 salan çû ser dilovaniya xwe. Erbîl li gel jiyana xwe ya wêjeyî û polîtîk, bi gotina xwe ya 'ez nivîskareke ku bi ser dînitiyê de diçim' li dû xwe şopek hişt.

Erbîl nivîskareke şoreşger a cîhanê bû. Li gel ku di qalibê heyî yên wêjeyê de bi cih nebû, di rêbazên civakê de jî bi cih nebû û ji pênûsa wê karakterên berovajî derdiketin pêş. Di 1996'an de piştî bidawîbûna rojiyên mirinê yên li dijî girtîgehên Tîpa F hatin meşandin şûnde, di eniya pêş de cihê xwe girt û di 2009'an de di 1'ê Gulanê de berê xwe da Taksîmê.

Erbîl di 12'ê çileya 1931'an de li Stenbolê hat dinê. Zarokek malbata çîna navîn bû. Li Zanîngeha Stenbolê beşa fîlolojiyê xwend. Bi çîrok nivîsînê dest bi nivîskariyê kir. Çîroka wê ya yekem 'Ugraşsiz' (Bêmijûl) di 1956'an de di kovara Seçilmiş Hikayeler de hat weşandin. Piştre di kovarên wekî Gîderek, Dost, Yenî Ufuklar, Yedîtepe, Papîrus, Ataç û Yelkenê de nivîsî. Leyla Erbîl di 19'ê tîrmeha 2013'an de li Stenbolê çû ser dilovaniya xwe. ***AMED***

Serrneweyê kurdan wa heme şaran rê xeyrên bo

ZAZA CEBELÎ

Serrneweyê kurdan her serre 13ê Çeleyî de yeno pîrozkerdiş. Şarê kurd seba ke serrnewyê xo pîroz bikero û seba nê hedrekerdişê pîrozkerdişê serrneweyî şewa serrneweyî de kuçlanî de pelxaçe û kilore dekerdê binê adirî, yanî binê wela adirî de pelxaçe pewjenê.

Ziwan, estonek û kayê ke verê hetê şarî ra serrnewe û veyveyan de ameyêne kaykerdiş, yew bi yew yenî vîrîkerdiş û no zî yeno manaya şarê ma raştîya xo rê xerî beno

Mîyanê na pelxaçe de qarmeyê goştî dekerdê mîyan û eynî wextî de zî mîyanê na pelxaçe de yew pere dekerdê mîyan ahînê wextî werdişê pelxaçe de nê pere qismetê kamî bîynê.

KOSE Û VEYVEKE ESTBÎ

Pîrozkerdişê nê serrneweyî de en muhîmî zî şewa serneweyî de yew kose û yew veyveke xo xemilnayênê û şîynê dam dam her keye gêrayênê veyveke û koseyî kay kerdê û wayîrê keyî ra şîrane waştê û nê şîrane zî bastêx, sinciq, kesme û qarmeyê goştî bîy. Wexto ke kose û veyveke kay kerdêne nê esna de zafî kesan gala veyveke kerdê waştê ke rîyê veyveke biveynê tabî koseyî zî seba pawitişê weyveke ra tedarikeya xo kerdê û daîmî destê koseyî de çiweyê ey hedre bî û kamî gala veyveke bikerdê se koseyî zî hema çiweyê xo veşênayênê û veyveke pawitênê.

Sewbîna tewir zî êreya yanî şan de yew keye de kom bîyênê şano kay kerdênê. Mesela bi nimune kaykerdişê şanoyî sînorê hêgayî kay kerdê û nê kaykerdişî de di kesan kay kerdê eynî wextî de nê di kesan her go yew kesî yew gede yan zî ciwan wegirotê maneyê xo û yew kes zî destê û lingê ey girêdayênê kerdê sînor.

YENO VÎRÎKERDIŞ

Wexto ke nê di kesan semedê sînorî şer kerdê palasqa reyde danê yewbînan ro esil derbî zî ayê ke wegirotî derbê înan werdê û sînor zî orte de kay kerdênê. Welhesil nê tewirê şanoyî zaf bî. La çi heyf ke ewro zî hînê kora beno se, pîrozkerdişê serrneweyê kurdan vînî beno.

Ewro zî hînê kura beno se nê tewir kulturê kurdan yeno vîrîkerdiş. Mesela roşanan de hedreyîya roşanî de seba hedreyîya bimbarikkerdişê roşanî kilîncey, patîla, zarbetî ameyênê pewtiş. Enka zî nê pewtişê kulturê werî hêdî hêdî yeno vîrîkerdiş. Wextê veyveyan de bi tewir tewir kaykerdiş bîyênê enka zî nê kaykerdişê veyveyî ra bi tena kaykerdişê govende û kaykerdişê kayê qilance mendo.

Helbûkî verê coyî zaf qeydeyê kaykerdişî bîynê. Mesela nê kaykerdişanê veyveyî ra kayê tirsî hema hema nêmendo. Kayê tirsê zî di kesan weniştê estore û estore xardanê, estore ser de şer kerdê. Enka zî veradê kayê tirsî hînê veyveyê verênî nêmendî û enka hema hema heme kesî salonan de veyve ronenê. Mesela kulturê kurdan de en muhîm çîyî zî estonek î; meseleyê dergi bîyênê. Wexto ke telewîzyonî hema çinîbî. Dewan de her şewe yew keye de kom bîyênê û merdimê verênan mesele û estonekan vatê heme kesî zî nê estonekî bi rewşa zerrî û keyfê coşî ra goşdaritê. Hînê kura bîynê se her kesê nê meseleyî û estonekî ezber kerdê.

ŞAR XERÎB BENO

Ewro zî veradê ezberkerdişê nê meseleyan mêrdimê verênî û kalî zî nê meseleyî û estonekan xo vîra kerdî. Hînê verade ewro dewan de yew keye de kombîyayîş yewer nêşonê meymaneya yewbînan. Enka zî herinda meseleyan û estonekan de her kes her şewe dîzîyan temaşe kenê û nê dîzîyan ezber kenê û nê sebeb ra zî her roj tikêyna kultur û ziwanê xo ra xerîb û durî benê.

Kulturo en muhîm zî ziwan o, êdî ameyo duştêko winasî ke ziwan zî ver bi vîrîkerdişî de şono. Dewan de verê coy yewerî tirkî nêzanayênê û enka zî heme kesî tirkî qisey kenê. Bitaybetî gedeyî (domanî) ziwanê maya xo ra hînê dûrî manenê. En çîyo ecêb zî mayî (dayikî) gedeyanê xo de tirkî qalî kenê. Çi wext ez şêra dewe û wexto ke ez gedeyan reyde qalî kena gedeyî zî bi israr ziwanê tirkî reyde cewab danê. Bi verênî ra asîmlasîyon keyê ma de yo û adir keyê ma de veşeno.

Asîmîlasîyono dîyin zî dibistanan de yo. Dibistanî zî keyeyê ma veşnenê û ma zî bi rewşa zerrî ra nê asîmlasîyonê dibistanan ra hes kenê. Nê warî de heyana kurdî xoserîya xo îlan nêkerê, her tim qirkerdişê ziwanî û kulturî do dewam bikero. Ganî no het de verê verkan hedreyî û rêxistinîya bingeyî ya xoserîya demokratîke bivirazîyo. Eke nê warî de heme kes bi rewşa zerrî ra xebata rêxistinî bikero, xoserî hîna leze ronîyena. Ewta de mesela her kes bi rewşa zerrî ra xebata rêxistinî nêkeno. Komelî, sazîyê partîyê legalî hema zî bi zîhnîyetê îqtîdarî ra hereket kenê. Eke no het de her kes bi hawayo durust û ehlaqî hereket bikero, o wext heme çî bi hawayo asanî hedre beno.

Newroze

Qela de adir no ta
Astorî hîrenê
Kayo kelebut de domanî
Şewa tarî

Roştîya adirê qela de
Şimşêrî bereqînê
Kile bî a wila
Şinga-şinga zincîla

Xortî ginenî war ro
Xortî vazenî ra
Hard lerzeno
Wele xij bena

Ko û banî roştî ya
Qela de adir mermolî ya,
Şewqê roştî eşto deyşte
Şimşêrî çuluskînê paytext,
Xortî, yew bi yew axe kenê virana xo
Şewqê Newroze rayîr da ma

Oncîno şar, rayîr ra rayir
Mermolîya adirê Newroze,

Qela de şawato toz
Adir gurro qela de,
şewe tarî ya, serd a
Çarê xortî bî vîlik
Şewqê adir mermol vîlik
Newroze şa bîye

MEHMET SEYÎTALÎOGLU

Zifqêre

PDK sey AKPyî têgêrena

Emrah Kelekçîer

Di rojî verê parlamentoyê Başûrê Kurdistanî ra 2 parlamenterê Tevgerê Goranî û Komala Îslamî hetê asayîşê ke girêdayeyê PDK yî ra ameyî tepiştiş û dima ra serbest ameyî veradayîş.

Merdim eşkeno vajo ke nê pratîkê PDKyî dalpeya peynî ke bîye sebebê ser de şîyayîşê bardaxe. Çimkî verê cû zî pratîko ke hetê PDKyî ra ame nîşandayîş qet baş nêbî.

Çend rojî verê Serekwezîrê dewleta tirk Bînalî Yildirimî bi heyetêk şî Başûrê Kurdistanî û ewja de PDK û hukmatê Îraqî zîyaret kerd. Merdim eşkeno vajo ke zîyaretkerdişê înan yê Yildirimî çiyêko normal o. Labelê wexto ke merdim hedefê zîyaretî ra ewnîyeno, o wext merdim fam keno ke çiyêko normal nîyo. Pêvînayîşê Serekê PDKyî Mesut Barzanî û Yildirimî peynî bî, her di vejîyayî vera çapemenî û îzehet dayî. Wextê îzehetî de Serekwezîrê dewleta tirk Bînalî Yildirimî hetê Mesut Barzanîyî de va 'Ma zanî ke PKK û PYD terorîst î.' No vatiş tim fekê îdarekaranê hukmatî ra yeno vatiş, labelê na rey no vatiş hetê Mesut Barzanîyî de ame vatiş û Barzanîyî zî vera nê vatişî de bêveng mend.

Xora bêxera nê vatişî çend hedefê bînî yê pêvînayîşî estbî. Înan ra yewe Şengal ra vetişê PKKyî bî. Yeno zanayîş ke Tirkîya zî, PDK zî wazenî ke PKK Şengal ra bivejîyo. Xora verê cû no waştiş hetê Neçîrvan Barzanîyî ra bi hawayo 'Ya PKK Şengal ra vejîyeno, yan zî ma bi zor vejenî' amebî ziwan. PDK nê nizdbîyayîşê xo reyde fikrê xo yê vera yewîya neteweyî de zî aşkere kerdbî. Xora no vatiş vera vengdayîşo ke KCKyî seba viraştişê yewîya neteweyî kerdbî ra dima de amebî dayîş. Yanî PDK vera yewîya neteweyî de vindetişê xo nîşan da.

Hedefo bîn yê pêvînayîşî zî vera PKKyî de meşnayîşê polîtîkayê çinkerdişî yo. Yeno zanayîş verê cû hem hetê Wezîrê Karê Zereyî Suleyman Soylu, hem hetê Serekwezîr Bînalî Yildirim û hem zî hetê Serekkomarî ra ameybî vatiş ke no zimistan do vera PKKyî de operasyonê girdî bêrî viraştiş. No pêvînayîş raştîya xo de seba awankerdişê bingeyê operasyonî ame viraştiş. Xora roja ke Bînalî Yildirim û heyetê ci şîyî Başûr, teyarayê dewleta tirk dewanê dormeyê Qendîlî ser de bombayî varnayî û netîceyî de heywan û bexçeyê dewijan zirar dîyî. Raştîya xo de no mesajêk bî; roja ke heyet şono Başûr, Qendîl ser de hêrişê bombeyinî virazîyenî. No çiyêko normal nîyo, çimkî vera nê bombekerdişî de hetê ti îdarekarê Başûrî ra reaksîyon nêame nîşandayîş.

Sey ke mi destpêka nuşteyî de zî va, PDK nika zî dest eşto tepiştişê parlamenteran. Di rojî verê Hewlêr de asayîşê ke girêdayeyê PDKyî parlamenteranê Tevgerê Goranî û Komala Îslamî tepiştî û dima ra serbest veradayî. Merdim wexto ke nê pratîkê PDKyî ra ewnîyeno, vîneno ke ti cîyayîya PDKyî AKP ra çin a; çimkî hukmatê AKPyî Vakurê Kurdistanî de hemserek û parlamenterê HDPyî tepiştî û eştî hepisxaneyan.

PDKyo ke verê cû zî bi pratîk û vatişanê xo xeylê reyan vera yewîya neteweyî de vindetişê xo nîşan dabî, bi nê pratîkê xo yê peyên yewna rey nîşan da ke nêwazeno yewîya neteweyî bivirazîyo. Eke yewîya neteweyî bivirazîyo, o wext do menfîetê înan bidekewo tehlukeyî.

Eke kurdî nêbî do şer bidomîyo

Rojnameger û nuştox Îbrahîm Gezîcî û nuştox Heysem Alîyî derheqê pêvînayîşê ke Astana de do bêrî kerdiş ser o qisey kerdî û wina vatî: "Eke vengê kurdan bidî çareserî û eke vengê kurdan nêdî do herême de şer dewam bikero"

AHMET KANBAL / MERSÎN - DÎHABER

Îbrahîm Gezîcî

Heysem Alî

20ê kanûna 2016 de hetê Rûsya, Îran û Tirikîya ra derheqê rewşa Sûrîye de Moskova de kombîyayîşêk amebî viraştiş û ewja de qerarê paytextê Kazakîstanî Astana de do pêvînayîşî bêrî destpêkerdiş amebî girewtiş. Pêvînayîşê ke destpêka ci do 23ê çileyî de bêrî kerdiş rê kamî beşdar bibî, hîna bi temamî dîyar nêbîyo.

Babete ser o Rojnameger û nuştox Îbrahîm Gezîcî û nuştoxê Ajansê Yakin Dogu Haberî Heysem Alîyî qisey kerdî.

Gezîcîyî va 'hîna bi temamî dîyar nêbîyo ke do pêvînayîşê Astana bêrî viraştiş yan zî nêrî viraştiş' û qiseykerdişê xo wina domna: "Eke dest pêbikerî zî do bi hawayo seqet dest pêbikerî. Deklarasyonê Moskova tena metnêko adirbestî yo û sey varyantêk yê pêvînayîşê Lozanî yo. Çimkî mîyanê nê pêvînayîşî de demokrasî û azadî çin o.

KOPYAYA CENEVRE YA

Gezîcîyî dewamê qiseykerdişê xo de va 'ti platform bê kurdan nêeşkeno netîce bigiro' û wina dewam kerd: "Nika ra netîceyê pêvînayîşê Astana dîyar o. Eke bi no hawa nê pêvînayîşî dest pêbikerî, beno sey pêvînayîşê Cenevre. Eke kurd û hetê demokratîkî tede ca nêgirî, nê pêvînayîşî sernêkewenî. Wina aseno ke Rûsya û Îran bi nameyêko cîya wazenî pêvînayîşê Cenevre reyna bidî destpêkerdiş. Yeno zanayîş ke pêvînayîşê Cenevre bi rayberîya Amerîka, Miletê Yewbîyaye (MY) û hêzê bînî de ameybî viraştiş û seba ke temsîlkarê kurdan çinêbî, sernêkewtbî. La ewro Rûsya û Îran wazenî heman pêvînayîşan bê Amerîka û MY bidî dibarekerdiş."

DO DÎYAR BIBO

Heysem Alîyî zî va 'pêvînayîşî Rojawan û Sûrîyeya Vakurî reyde nizdî ra eleqeder î' û qiseykerdişê xo wina domna: "Îqtîdarê AKPyî ke nêwazena kantonê birêsî pê, nê semedî ra hewl dana şerî heme Rojawan de vila bikero. Heleb de artêşa Sûrîye û YPGyî pê reyde koordînasyonêk mîyan de bî, reyna Vakurê Helebî de zî artêşa Sûrîye û HSD mîyanê koordînasyonêk de bî. No koordînasyon herême ra girêdaye yo yan zî dewleta Sûrîye wina wazena, dîyar nîyo û do mîyanê demî de dîyar bibo. Yeno zanayîş ke Sûrîye nêwazena ke Tirkîya Bab de bimano û heta wexto ke Tirkîyaye bi teyarayan hêrişê YPG kerdbî, Sûrîye vatbî eke dibare bibo, ê do bidî teyarayan ro. Labelê pêvînayîşê Rûsya û Tirkîya ra dima, teyarayê Tirkîya reyna Bab ser de firayî. No zî nîşan dano ke mabênê Şam û Rûsya de fikrê cîyayî estî."

KURDÎ NÊBÎ ŞER ESTO

Alîyî dewamê qiseykerdişê xo de va 'tena cîyayîya pêvînayîşê Astana, rayberî nêkerdişê Amerîka yo' û qiseykerdişê xo wina qedêna: "Seba pêvînayîşî welatê kendawî, Misir û Îraq ameyî dawetkerdiş. Labelê çinêbîyayîşê Amerîka destê Rusya û Îranî qewetin keno. Eke kurdî nê pêvînayîşan de ca nêgirî do şer zaf derg bibo. Eke vengê kurdan bidî do çareserî, vengê kurdan nêdî o wext do şer ser o munaqeşe bikerî."

Ma seba çareserî pîvanê xo dîyar kerdî

BERÎTAN SARYA / RIMÊLAN - ANF

HEMSEREKA Federasyonê Demokratîke ya Vakurê Sûrîye Hedîye Yusufe derheqê pêvînayîşê ke do Astana de bêrî kerdiş de qisey kerde.

Hedîye Yusufe va 'ma verê cû projeya federasyonî îlan kerdbî û na zî parçeyê çareserî ya' û qisekerdişê xo wina domnaye: "Ma nê qerarî şarê ke Vakurê Sûrîye de cuyenî, reyde girewt. Teberê ma de zî yê ke hewl danî xo rêxistine bikerî, estî. Nînan heta nika ti çareserî aver nêberdo. Kombîyayîşo ke Astana de bêro kerdiş zî nînan ra yew o."

ADIRBEST ÇARESERÎ NÊANO

Hedîye Yusufe dewamê qiseykerdişê xo de va 'Tirkîya, Rûsya, Îran û heme hêzê ke wina hereket kenî, wazenî şert û xeta xo ma ser de bidî qebulkerdiş' û wina dewam kerde: "Eke wina bibo, kombîyayîşê Astana do sernêkewo. Çimkî hêzê xo şarê herême ra nêgêno, piştîya xo dano hêzê sîlehinan. Hêzê sîlehinî zî Sûrîye rê çareserî nêanî. Tena adirbestêko zeyîf zî problemanê Sûrîye çareser nêkeno. Reyna pêvînayîşî do ser kamcîn esasan ra aver şêrî, dîyar nîyî. Cok ra ma eşkenî vajî ke do kombîyayîş sernêkewo."

BÊ MA SERNÊKEWENO

Hedîye Yusufe peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Ma sey hêzêko esasî nêameyî dawetkerdiş. Eke ma bêrî dawetkerdiş, pêşnîyaza ma seba çareserî dîyar a. Xora dewleta tirk nêwazena ke ma beşdarê kombîyayîşî bibî. Çimkî destê ma de projeyî estî. Hêzê ke do beşdarê kombîyayîşî bibî hîna na babete de pê nêkerdî. Projeyo ke ma tede nêbî, sernêkeweno."

Birîyayîşê cereyanî girêdayeyê bêplanî ya

Stenbol de her ke şono birîyayîşê cereyanî zêde beno û ame musayîş ke rojê verênan de do birîyayîşê cereyanê Stenbolî vilayê zaf bajaran bibo.

Babete ser o Odaya Muhendisê Cereyanî (EMO) yî ra Koordînatorê Yewîna Cereyanî Olgun Sakaryayî qisey kerd û qala sebebê birîyayîşê cereyanî kerd.

ARIZÎKERDIŞ VER

Sakaryayî qiseykedişê xo de bale ant sektorê ke ameyî arizîkerdiş ser û wina va: "Eke merdim goreyê pîyasaya serbestî şêro, tabloyêka winasî vecîyena vernîya merdimî. No sektor bîyo sey sektorê bazirganî. Ma netîceyê polîtîkayan de kewtî na rewşe. Birîyayîşê cereyanî ra dima zaf mehneyî erzîyayî orte. Ge vatî arizeya xete esta, ge vatî sabotaj o û ge zî vatî ke kabloyê cereyanî birîyayî. Temînkerdişê cereyanî de gaza xozayîne zî zaf muhîm a."

ROLÊ GAZA XOZAYÎNE

Sakaryayî qiseykerdişê xo de qala muhîmîya gaza xozayîne kerd û wina va: "Sera 40ê gaza xozayîne, temînkerdişê cereyanî de yeno xebetnayîş. Keyeyan de xerckerdişê gazî zêde bîyo. Cok ra zî gaza xozayîne zêde şona keyeyan. Na zî xo dima kêmîbîyayîşê cereyanî ano. Goreyê îstatîstîkê serra 2015î, cereyan sera 40 bi gaza xozayîne, sera 15 zî bi komirê îthalî ameyo temînkerdiş. Yanî cereyano ke ma gênî sera 55ê ci bi çimeyanê teberî ra yeno temînkerdiş."

ANQARA - DÎHABER

Ganî ciwanî têkoşîn bidî

Rêxistina Ciwanê Welatperwerî ya Başûrê Kurdistanî Unîversîteyê Kerkûkî de semînerêk viraştî. Semîner bi nameyê 'Çareserîya krîzî de rolê ciwanan' ame viraştiş.

Kombîyayîşê ciwanan de endamê rêxistina ciwanan Brusk Kerkûkî qisey kerd û rolê ciwanan ame munaqeşekerdiş.

Brusk Kerkûkî qiseykerdişê xo de bale ant hêzê ciwanan ser û wina va: "Ganî ciwanî her ca de xurt bibî û vera sîstem de têkoşînê azadî bidî. Bedilîyayîşê sîstem û cuya neweyî de ciwanî hêzêko tewr pîl o. Hêzê ciwanan girêdayeyê emrî nîyo. Ciwanî gêrayîşê heqîqetî yî. Îqtîdar ciwanan ver de asteng o. Labelê ciwan zanaye yî û vera sîstem de wayîrê hêzêko rêxistinkerde yî. Zanabîyayîşê komelî girêdayeyê ciwanan o. Sîstem her wext bi hêrişanê xo yê lîşinan wazeno komelî kontrol bikero. Seba komeleyêko newe û weş, ciwanî heme polîtîkayan ver de mîyanê hereket de yî. Hêzê ciwanan do ser bikewo." ***KERKUK - ANF***

Tirkîya ver bi otorîte û faşîzmî ra şona

Tirkîya de badê teşebusê derbe û îlankerdişê rewşa OHALî, demokrasî û huqûq mîyanê şarî ra wedarîya. Hemwelatîyê ke wayîrê bawerî, sîyasî û îdeolojîyê cîya cîyayan î, Kocaelî de vera bedilnayîşê qanûno bingeyî de bin nameyê Tevgerê Demokrasî yê Kocaelî de ameyî têhet û rêxistinbîyayîşê xo awan kerdî.

Babet ser o verfekê tevgerî Bekîr Yurdagul, Alî Haydar Konca û endama KDGyî Arzu Erkane qisey kerdî.

Bekîr Yurdadagulî qiseykerdişê xo de wina va: "Her kes xo anto hetêk û heme çîyan temaşe keno. Hedefê ma cesaret o. Ganî ma cesaret bidî şaran û raştîya tarîtîya Tirkîya bidî famkerdiş."

TIRKÎYA VER BI FAŞÎZMÎ ŞONA

Alî Haydar Koncayî zî qiseykerdişê xo de bale ant antîdemokratîkbîyayîşê Tirkîya û wina va: "Tirkîya ver bi faşîzm û otorîte şona. Komeleyê demokratîkî orte ra wedarîyayî. Tevgerê ma bi hêrişan ra dima awan bî. Eke sîstemê îqtîdarî meclîs de bêro qebulkerdiş, Tirkîya do ver bi tarîtî şêro. Ewro ganî ma vera neheqîyan de têkoşîn bidî."

Arzu Erkane zî qiseykedişê xo de wina va: "Kocaelî de şîddet zaf o. Ma do her wext vera şîddet, îstîsmar û qetilkerdişan de têkoşîn bidî. Parlementerê ma yê HDPyî hepisxaneyê Koaelî de yenê vindarnayîş. Tevgerê Kocaelî do bibo vengê cinîyan."

KOCAELÎ - DÎHABER

www.arsiv.kurdi-medya.com

ROJEVA Medya
13 Çile Ên 2017

ROJEVA MEDYA
Ararat Basın - Yayın
Reklamcılık Adına

İmtiyaz Sahibi:
Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü:
Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3 *Yenişehir-DİYARBAKIR*

Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı *(ÇAP):*
İstanbul: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. *No:* 23/A
Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
*No:*13/A *Yüreğir / ADANA*
*Tel:*0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail:
rojevamedya@hotmail.com

LI BAXÇEYÊ dêrê mizgeft çêkirin



Bajarê Wanê di dîrokê de gelek şaristaniyên wekî Ûrartû, Pers, Bîzans û Asûr re maloavanî kiriye. Li gundê Yedîkîlîse (Bakraçli) yê li quntarên çiyayê Erekê yê Wanê, keşîşxaneyek ku ji dema ermeniyan maye heye. Gundê Yedîkîlîse ji aliyê ermeniyan ve wek 'Seşunîs' tê zanîn û derdora wê jî wek herêma 'Vaspuragan' tê zanîn. Ji ber vê navê 'Varana Vank' dane dêrê. Heta 2011'an li dêrê ayîn dihatin kirin lê piştî erdhêja Wanê dêr bi tevahî hat girtin û li baxçeyê dêrê mizgef hat çêkirin.

Dêra Varana Vank bi navên cuda tê zanîn û çêkirina wê jî ji aliyê gelê ermenî ve girîng tê dîtin. Di çavkaniyên ermeniyan de tê gotin ku parçeyekî xaça Îsa pêxember anîne gundê Yedîkîlîseyê. Parçeyekî dibin keşîşxaneya Varagavankê. Xaç du caran winda dibe û dîsa tê dîtin. Tê gotin ku xaç piştî dagirkirina Rûsyayê ya 1915'an de li Wanê winda bûye.

Dêra ku ji 7 beşan pêk tê, ji aliyê xiristiyanan ve jî wek cihekî girîng tê dîtin. Lê ev dêra ku xwedî dîrokeke kevnar e ji ber xemsariya rayaderan bi tunebûnê re rû bi rû ye û heta aliyekî dêrê wekî axurê tê bikaranîn. Her wiha avahiya dêrê ya dîrokî bi çêkirina mizgefa ku li baxçeyê wê hîn zêdetir zirar dîtiye. **WAN - ŞÛJIN**

Vexwarina taybet a zivistanê

Qehweya kizwan

Li Colemêrgê, qehweya kizwanan angu **qehweya egîdan a bi sedan sal e wek nîşaneya qîmetdayînê berpêşî mêvanan tê kirin,** di demsala zivistanê de yek ji cureyên vexwarinan e ku herî zêde tê vexwarin

Qehweya ku li Colemêrgê ji kizwanan tê çêkirin, di zivistanan de vexwarina taybet a gelê herêmê ye. qehweya kizwanan, li herêmê ji ber fêdeyên wê û ji ber ku wek nîşaneya qîmetdayînê tê zanîn, bi navê "qehweya egîdan" tê binavkirin. Bi taybetî zivistanan daxwaza ji bo qehweya kizwanan zêde ye.

Welatiyê bi navê Musa Şahin wiha got: "Li herêma me darên kizwanan zêde şîn tên, payîzan em bittimên wan berhev dikin, difiroşin bêhnfiroşan û pê debara xwe dikin. Li gundên me payîzan karekî zêde em bikin tune ye û em bi vî awayî debara xwe dikin."

Bêhnfiroş Hayrettin Karaman jî got ku piştî sarbûna hewayan qehweya kizwanan zêde tê firotin û diyar kir ku carinan li gundê wan nêzî 4-5 ton bittim tê berhevkirin û ew wan stok dikin. Karaman anî ziman ku ew hinek ji van bittiman diqelîne û hinek jî bêyî ku biqelîne li makîneyê dixe û wekî qehweya kizwanan paket dike.

Karaman destnîşan kir ku li gel qehweya wê benîştê kizwanan jî dema mirov sibehan tev li hingiv bike û beriya taştê bixwe pir bi feyde ye. Karaman diyar kir ku ew qehweya kizwanan îxracî gelek welatên Ewropayê, Rûsya û Iraqê jî dikin û wiha got: "Di payîzê de em ji aliyê Elk, Çelê û Şemzînanê bittimê dikirin. Em stok dikin û difiroşin gelek welatên din. Di warê tenduristiyê de gelek fêdeyên qehweya kizwanan hene û her wiha di zivistanê de ji bo sermayê jî ji dêvla dermanan mirov vê bi kar tînin. Li herêma me hem qehweya wê hem jî benîştê wê bi salan e tê bikaranîn." ***COLEMÊRG - DÎHABER***

Bazara wan kesad e

Li bazara taxa Firatê ya Kolika Semsûrê, esnafan anî ziman ku ew li dezgehên seroberê dixebitin û ji ber firotin çênabe bi gilî û gazinc in. Bazarvanan diyar kir ku siyasetmedarên ku di hilbijartinan de soz dane wan, piştî hilbijartinê ber bi wan ve nehatine û gotin ku ew di rojên zor û zehmet re derbas dibin.

Esnafê bi navê Abûzer Sandi anî ziman ku hêza kirîna gel a ji bo sebze û fêkiyan nemaye û destnîşan kir ku ew ji ber van zeman nikarin kar bikin û alternatîfa wan ji bo karekî din bikin tune ye û wiha axivî: "Ji ber şer û krîza aborî bi gel re pere nemaye. Kes ji bo danûstandinê nayê. Em bi 2 hezar an jî 3 hezarî mal dikirin. Lê belê ji ber ku firotin çênabe em heqê malê xwe jî derxînin."

Sandi destnîşan kir ku ew ji ber nefirotina malên xwe nikare debara malbata xwe bike û ev tişt anî ziman: "Em zebze û fêkiyan buha dikirin. Mînak, em firîngiyan bi 2 TL'yan dikirin. Lê belê, dema nayê firotin, ji bo ku em ji destê xwe derxin, bi 1,5 TL'yî difiroşin. Em mandalîna û pirteqalan bi lîreyekê dikirin, bi 75 qurişan difiroşin. Heke em nefiroşin dê di destê me de bimînin. Kes ji derdê me fêm nake. Kes dengê me nabihîze." ***SEMSÛR - DÎHABER***

Pirsgirêka 2 malbatan hat çareserkirin

Li herêma Girkê Legê di navbera malbata Hisên Cedûyî ya ji gundê Rimêlan Paşa yê girêdayî Girkê Legê û malbata Hacî Îsmaîl El-Eto ya li bajarê Girkê Legê de pirsgirêk derketibû. Ev pirsgirêk gihaştibû wê astê ku ji her du malbatan 2 kes bi guleyan werin birîndarkirin.

Meclisa Lihevanînê ya Girkê Legê ji bo çareserkirina pirsgirêka her du malbatan ket nav liv û tevgerê û bi her du malbatan re li navenda Meclisa Lihevanînê civiya. Di civînê de endamên meclisê, nûnerên her du malbatan û rûspiyên kurd û ereb ên herêmê jî amade bûn.

Her wiha her du malbat li ser daxwaza civatê li hev hatin û şertên lihevkirinê îmze kirin. **GIRKÊ LEGÊ ANHA**

Li Gola Wanê keştiya rûsî HAT DÎTIN

Di Gola Wanê de ev salek û nîv e lêkolînên têne meşandin û di lêkolînan de keştiyeke rûsî ku di veguhestina çek û cebilxaneyan de dihate bikaranîn, hat dîtin.

Lêkolînên ku ji aliyê Derhênerê Dîmênên Binavê Tahsîn Ceylan, Serokê Komeleya Lêkolînên Binavê yên Gola Wanê (VANSAD) Dr. Mustafa Akkuş û tîma 6 kesî ve li perava Çanakduzu ya herêma Reşadiye ya Bedlîsê têne meşandin, keştiyeke rûsî ku di sala 1958'an de bin av bûbû, 40 metreyan di binê avê de hat dîtin. Li gorî dîmênan li ser keştiyê 'Akdamar' nivîsiye û hê jî saxlem e.

Xebatkarê lêkolînê Tahsîn Ceylan anî ziman ku gola Wanê bi siran dagirtiye û ji bo ku ew van siran deşîfre bikin dixebitin û diyar kir ku ji ber keştî aîdî rûsan e ew dixwazin bi lêkolînerên rûsî re hevpar bixebitin. **WAN**

WWW.ARSIVA.COM